

Hewpeyvîn bi Şêrko Bêkes re:  
Bersiva baştirîn ji bo  
nîjadperestan têkoşîna  
şoreşgerane ye

*Rûpel 8 - 9*

Nûçe:  
Hêza Çakûç Erbakan anî  
ser riya 'Pergala Nû'


*Rûpel 16*

Gotara Lerzan Jandîl:  
Zarava kirmanckî ser ro  
tenê pirtûkî

*Rûpel 11*


**Roj bi mirinê dest pê dike**

NAVEROK




4

Î.Omerî: Ew li dadgehê ne bersûc lê dozdar bû



11

Yekîtiya Nivîskarê Kurd tê avakirin



13

Sami Tan: Çîrokên 'Bajarê Mirinê'

Ji Xwendevanan


**HEVALÊN hêja, em li ser navê TADER'ê (Komeleya Malbatên Girtiyên) silavên germ û şoreşgerî pêşkêş dikin, di xebatên we yên hêja de serkeftinê dixwazin. Bi rastî jî xebateke bi vî rengî di şert û mercên îro de bêhem-pa ye. Daxwaza me ev e ji we ku hûn di rojnameyê de ferhengokê bibeşî-nin û hê bêhtir cih bidin cografaya Kurdistanê û bûyerên nûçeyî.**

EMÎN ÎLHAN/EDENE

**BI RASTÎ ez geleki kêfxweş im ku ez hîni zimanê tirkî nebûm. Dibe ku şansê min ê herî mezin hînnabûna zimanê tirkî ye. Dîsa kêfxweş im ku êdî em bi zimanê xwe dixwinin û dinivîsî-nim. Lê gerek e her kes zanibe ku; îro ev rojname û kovarên kurdî, MED-TV hemû bi xwîna şehîdan weşanên xwe dikin. Lewre jî her welatparêzî tê xwestin ku qedr û qîmeta van nîrxên neteweyî zanibin û qîmetê li wan bigirin. Ji hêlekî ve çiqas Azadiya Welat, Rewşen werin xwendin, li televîzyona MED'ê were temaşekirin û bersiva wan were dayîn, ew qas jî li şehîdên serxwebûn, azadî û serfiraziya welat xwedî derdikevin.**

Di dawîya nameya xwe de silav û hurmetên xwe yên şoreşgerî ji hemû xebatkar û xwendevanên Azadiya Welat re dişînim.

BEDREDÎN UÇAR BARTIN



Hinek dikan hinek dixwin?

MEHMET GEMSİZ

**D**i nav me de ji bo kesên loqek û erzan biwêjek heye; "tirşikçî" an jî "tirşikxwar". Îcar çî dema ku tevgera azadîxwaz zor dide tevgera azadîkuj, ew loqek û tirşikxwar derdikevin holê. Em dibêjin derdikevin holê, lê belê tevgera azadîkuj bi destê wan digire wan datîne pêşiya nûnerên doza kurdî. Ev rewş jî demên ku çareserî dikeve rojevê diqewime.

Hêzên serdest her tim metodeke wiha bi kar anîne. Ji nav gelê bindest kesên loqek, kesên xwefiroş û ceşx derxistine û ew li hemberî gelên wan bi kar anîne. Bi wan, têkoşîna gel an fetisandine an jî piç û parî avêtine ber wan û bi vî awayî têkoşîn û şoreş jî rê avarê kirine.

Bi ragihandina agirbesta pêşîn ji aliyê tevgera azadîyê ve, ev metod ji aliyê komara kemalî ve, bi şeweyeke eşkere hate bikaranîn. Hin kes xwe çivçivandin û vîtevî kete wan. Lê ew têkçûn û miradê wan di ber wan de ma. Piştî ragihandina

agirbesta duyemîn, îcar vê rewşê hin eşkeretir rûda.

Ji hêlekê ve nimînenendeyên dewleta dagirker tevî hin kesên "kurd" civînen veşarî pêk tîne û ji hêlekê ve jî lê dixebitin ku tevgera azadîyê bifetisînin. Di civînan de, tê xwestin ku kurdên ku ne ji aliyê tevgera azadîyê ne, bêne birêxisin û wekî nimînenendeyên gelê kurd derkevin pêş û serî ji PKK'ê bistînin. Her wisa bêtî PKK'ê gelşa kurdî çareser bikin.

Ev civînen veşarî eşkere dibin. Li gorî nûçeya Demokrasiyê (22 tîrmeh, roja duşemê), du civînen veşarî yek li Parîsê (di navbera mêtûyên 22-29'ê adarê de) û ya din jî li bajarê Luganoya Swîsreyê (di navbera mêtûyên 31'ê gulana û 11'ê pûşperê de) pêk hatine. Civîna jî bi rêberiya Koma Aştiyê ya Osloyê an jî bi navê wê yê din Enstîtuya Legerîna Aştiyê /Oslo (PRIO) li dar ketine.

Ev sazî di dema gotûbêja di navbera rayedarên Filistin û Îsraîlê û Afrîkaya

Başûr de jî navê xwe derxistibû. Ev lihevruştin eşkere bûn, bi tevî beşdaran ve. Civînê ku veşarî mane li dera hanê.

Lî aliyê din jî, li serokê PKK'ê suikast dikin, bi hinceta daxistina ala tirk di kongreya HADEP'ê de di serî de serokê wê yê giştî û rêveberên wê tîr girtin û endamên wê tîne kuştin û weşana MED-TV'yê tê rawestandin.

Pêkanîna civînen veşarî û bûyerên ku me li jorê ji wan behs kir, hemû bi hev ve girêdahî ne û fermana wan li navendekê hatine dayîn. Em vê jî bibêjin ku di van bûyer û qewimînan de ne tenê tiliya dewleta tirk heye, tiliyên împeryalîstan, di serî de jî ya Amerîkayê heye. Li dijî tevgera azadîyê tev bi hev re dixebitin.

Îcar "kurmên me" jî di milên wan de ne. Serdest ji bo ku bi ser bikevin ji xwe re li noker û xulamokan digerin. Van bi hin tiştên ne tişt ditamijînin û wan dikin fişekên tivingên xwe û gelên wan bi wan didine kuştin, tevgera wan bi wan didine temartin. Lê belê, her çiqas gelê kurd hatibe kuştin, gundên wî hatibin wêrankirin, ji av û aqarên xwe hatibin dûrxistin jî, dîsa ji doza xwe negeriyaye û di destpêkê de dabe dû kê û îradeya xwe spartibe kê hin jî wisan e. Êdî ew gotina pêşiyên me, a ku em ew ji nivîsa xwe re kire sernav nema ku rast derkeve; kî bike wê bixwe jî.

Tevgera azadîyê û guhertinên nû

Î. HALİL KOŞAR

**T**evgera rizgariya neteweyî di her alî de guhertinên nû çêdike. Ev guhertin hem di hêla jiyana gelê kurd û hem jî di hêla kesîtiya kurdan de dibin. Guhertin û veguhertin zagoneke materyalizma diyalektîk e. Û zanistiya mirov di Kurdistanê de di bin van mercên zor de, bixwaze û nexwaze jî guhertin dîsa çêdibin.

Dem a ku mirov ji dervê lê dimeyzi-ne dibe ku nebîne, lê bi her kesîtiyeke kurd re pêşketin û guhertineke mezin heye. Ev guhertin di hin mirovan de (hejmara van gelek zêde ye) bi pêşveçûyîn e; di hin mirovan de jî paşveçûyîn e.

Ku mirov di ramana xwe de, di pratîka xwe de bixwaze bi pêş ve here û bi xebata xwe, keda eniya xwe, derbasî jiyane bike wê pêşketin pê re çêbe. Lê ku fikra mirovan ne paqij be, di kesîtiya mirov de tu carî pêşketin nabe. Heta ew mirov fikra xwe paqij neke, wê ew rewş bidome. Wê ew her dem di nav jiyana şoreşgerî û kevneperest de here û were. Ev pêvajoyê heta hetayê neçe. Ev mirov an wê jiyana kevneperest a ne baş biavêje û wê bibe şoreşger; an wê jiyana şoreşgerî biavêje û yê bibe kevneperest.

Nexasim di bin van şertan de divê mirov refê xwe baş bipejirîne. Ji ber vê yekê jî, divê mirov her tim riya baş, ya birûmet, ya mirovatiya nûjen bide pêşiya xwe. Gotinek heye dibêje: "Kirina qencî û xerabiyê ji destê mirovan e." Li ser vê gotinê em karin bibêjin ku, mi-

**Piştî xebata giran û payebilind ku hê jî didome, dengê kanî û robaran dîsa xweş hat. Şênahî û şahî ket nav dilê gelê kurd û bi ser xwe ve hat. Xwe nas kir, mirovatî nas kir, Serok nas kir, neteweya xwe nas kir. Di bin rêberiya rêxistina xwe de, di dergûşa şarisaniyê de hêviya azadîyê dide gelê cîhanê.**

rov karê qencyê bike û xwe biguherîne, an kare xerabiyê bike û di nav nebaşî, kevneperestî, doxmanî û sîxuriyê de bimîne. Em vê nivîsa xwe bi gotineke pêşiyên bidomînin, "Di newalên kûr de ranezê ku tu xewnên giran nebî-nî."

Belê heke em nexwazin xewnên giran bibînin, divê ji berî her tiştî, em xwe li hemberî têkoşînê di ber çavan re derbas bikin. Ka em di çî rewşê de ne? Em her roj, her şev û her demjimar çiqas xewnên giran dibînin? Rastiya me, راستiya welatê me çî ye? Tevger çawa diguherîne? Em bersiva van pirsan hemûyan bidin.

Gelê kurd mîna ku ketibe gorê, ketibû xeweke giran. Di nav jiyaneke kevneperest de dijiya. Heta ku rêber û pêşkêşên tevgerê du gotin xistin serê wan, gelek zor û zehmetî kişandin, bi saetan, bi mehan û bi salan ji bo ku tîkiliyekê bi mirovekî kurd re çêkin xebitîne û xwêdana eniya xwe rijandine û tu carî jî ji wê rewşa xwe aciz nebûne, danaketine xwarê.

Gotineke Serok heye: "Baweriya min bi guhertina mirovan pir heye." Nêrîn û nêzîkahiya endamên tevgerê li ser vê bingehe çûbûye.

Di hêlekê de artêşa tirk û di hêlekê de jî tevgerên reformîst astengeke mezin derxistine pêşiya tevgerê. Bi

ser van de jî, nezanîna û bêtifaqiya gel. Bi van şertên dijwar re ketin şer. Nese-kinîn, serma, seqem, birçîbûn ne di bî-ra wan de bû. Li ber xwe dan, heta ku bi ser ketin. Bi jiyana xwe, bi kesîtiya xwe, xwe bi gelê xwe dan pejirandin. Bi zarokan re bûn zarok, bi dayikan re bûn dayik, bi kalan re bûn kal, bi kesê oldar re bûn oldar. Bi vî awayî di nava gel de cihê xwe yî bi rûmet girtin.

Rûmet dan jiyana gel, lê bi temamî jiyana wan nepejirandin. Li gorî bîrdozîya xwe, bi jiyana gel a kevn re ketin şer. Rexne li jiyana gel a kevn û eşîrtî û oldar re kirin. Jiyana nû; ya birûmet, ya sosyalîst, bi wan dan pejirandin.

Piştî vê xebata giran û payebilind rûyê gelê me vebû, dilê wî şad bû. Di nav serhildan û raperînan de bû volqan û li paş tu bendan nesekîni û hemû dane ber xwe. Bayekî hênîk û xweşik dîsa bi ser gelê me de hat.

Em ji mal derketine, em ji nav jiyaneke dijminî derketine û me berê xwe daye jiyaneke nû. Em ketine nav refên şoreşê. Jiyana ku dijmin daniye pêşiya me, me nepejirandiye û ji bo ku bigihî-jin jiyaneke nû û azad, em hatine nav şoreşê. Tu kes ji bo wê nikare tişteki ne baş bibêje.

Lê belê piştî wê gavê jî divê em tiştê ku serokatiya neteweyî analîz kiriye, di kesîtiya xwe de bi cih bikin.



**SEROKA** Koma Sosyalîst a Parlemantoya Ewrûpayê Paulina Green bi nameyekê ji hikûmeta Tirkiyeyê xwest ku dawiyê li bûyerên derveyî mafên mirovan, li taybetî yên ku bûne sedema rojiyên mirinê, bîne. Wê got: "Heke dawî li van bûyeran neyê, emê jî mafên xwe yên tengavkirina alîkariya aborî ya ku Yekîtiya Ewrûpayê dide Tirkiyeyê bi kar bînin." Green di nameya xwe de ji hikûmeta tirk van daxwazan dike: Bersiva agirbesta PKK'ê bê bidin; kesên ku mafên mirovan bînpê dikin bidarizînin; bi malbatên girtiyan re hevdiin çêbikin; destûrê bidin çavdêrên navneteweyî ji bo ku li girtîgehên lêkolînan bikin.




**LI MERSÎNÊ** jî şaxeke Navenda Çanda Mezopotamyayê hate avakirin. Piştî Stenbol, İzmir, Edene, Amed û Hewlêrê li Mersînê jî di 26'ê Tîrmehê de bi çalakiyê çand û hunerî şaxeke NÇM'ê ve-bû. Bi beşdariya HADEP'ê, İHD'ê, hunermend, komên muzîkê, şanoyê wê li Mersînê jî dengê çand û hunerî yê gelên ku nikarin xwe îfade bikin, bilind bibe. Seroka Navenda Çanda Mezopotamyayê Nuray Şen mebesta avakirina şaxên NÇM'ê wiha diyar dike: "Gelên ku kultura wan tê qetilkirin wê xwe bi hêsanî bikaribin li NÇM'yan îfade bikin." Şen bang li ciwanan kir ku heke ew bixwazin bi çandê hevbêş perwerdehiyê bibînin, bila herin NÇM'ê.


## NÛÇE

# Roj bi mirinê dest pê dike


**Hejmara girtiyên ku dimirin her roj zêde dibe, roja pêncşemê ku ev nûçe dihat amadekirin, sê girtiyên din can dan; li Girtîgeha Aydınê Müjdat Yanat ji doza DHKP-C'ê, li Girtîgeha Enqereyê Hüseyin Demircioğlu ji doza MLKP'ê û li Girtîgeha Bursayê Ali Ayata ji doza TKP-ML'ê. Bi van kesan hejmara şehîdan gihîşt 6'an, lê heke ev rewş wiha dom bike, wê ev hejmar zêdetir bibe.**



Aygün Uğur



Altan Berdan Kerimgiller



İlginç Özkeskin

**H**ikûmeta ANAYOLê dema ku hate damezrandin, wezaretê dadê ket destê Gerîndeyê Polîsan ê kevnare Mehmet Ağar. Wî jî di roja yekemîn de bi çend giştînameyan (tamîm) daxuyand ku "girtîgeh divê bi sistemeke nû werin îdarekirin û sistema minak jî ya Girtîgeha Eskişehirê ye." Ji ber vê yekê jî girtiyên hemû hêzên siyasî yên çep û welatparêz dest bi greva birçîbûnê kirin. Lê belê Ağar tu car guh neda vê yekê. Ji destpêkê heta îro jî her tim malbat û piştgirên girtiyan bi fermana Ağar, her tim lêdan xwarin û hatin binçavkirin. An li Stenbolê, an li Enqereyê an jî li Edene, İzmirê û hwd.

tiştê bala wan nekişand ser vê riya mirinê. Her çiqas îro bala xwe bidin jî; ev yeka han ji bona veçirandina îktidara RP'ê ye. Ne etîka mirovahî ye. Ji ber ku wan di dema Mesut Yılmaz de dengê xwe nedikirin. Ev helwesta çapemeniyê ya niha piştî helwesta Erbakan li hemberî çapemeniyê derket holê. Erbakan daxwaza Aydın Doğan û Dinç Bilgin a lihevhatinê jî red kiribû.

### Parêzerê qetliama Sêwazê hat cihê şefê polîsan

Hikûmeta Erbakan ku hate damezrandin wezaretê dadê ji Mehmet Ağar standin û dan parêzerê kiryarên qetliama Sêwazê Şevket Kazan. Wezîrê nû bi lez û bez tamîmek nû daxuyand û da zanîn ku tamîmên Mehmet Ağar ji holê rabûne, ji vê yêke jî girtî divê dev ji grevê berdin. Lê belê girtiyan ji vê da-fîkê fêm kirin û biryara berdewamiya grevê standin. Wezîr Kazan vê carê rûyê xwe yê esas nîşan da; got: "Girtî bi rastî birçî namînin, ji ber ku wan beriya grevê kantîn vala kirine û niha jî bi dizîka dixwin." Çapemeniyê ev gotin bi awayekî baş (!) kir nûçe. Dûv re ku li Girtîgeha Ümraniyeyê di roja 64'an de Aygün Uğur, li Girtîgeha Bayrampaşayê, di roja 65'an de Altan Berdan Kerimgiller û di roja 66'an de İlginç Özkeskin mirin, çapemenî û rewşenbîrên tirk çavên xwe hinekî vekirin û li derdora xwe nihêrtin (!) Mînak rojnameya Hürriyetê roja ku hejmara miriyan bû du kes manşeta xwe ji "sporun gü-

zelliği" yanê bedewiya werzişê, Milli-yetê jî ji "Çiller'in fon kumarı" (Qumara Çillerê ya fonê) re veqetandin. Bêguman bala wan li ser van mijaran bû.

### Polîsan nehişt ku wesiyet jî bê cih

Piştî mirina Aygün Uğur cenaze bi destê polîsan hate revandin. Bavê Aygün Uğur Gülabi Uğur diyar kir ku polîsan bi zordarî cenaze revandine û dane hilanîn (binaxkirin). Her hal vê yekê jî têra polîsan nekir ku cenazeyê Kerimgiller jî bi wî rengî şandin Tarsusê.

RP'ê niha di du waran de tengezar bûye. A yekemîn, RP dixwaze ku di pêşî de xwe bi generalan bide hezkirin. Ji ber wê yekê jî gere xwe bêta-wîz nîşan bide. A duyemîn jî, gere hêzên nav xwe frên (zeft) bike. Ji ber vê politîkayê ye ku, hemû çalakiyên malbatên girtiyan bi destê polis û cendirmeyan hatin astengkirin û xwîn hat rijandin, gelek kes jî hatin binçavkirin.

Gava ku filmên van bûyeran di televîzyonê de hatin nîşandayîn li gelek deverên gerdûnê bûn sedema protestoyan. Wezîrê karê derve yê Fransa û Almanyayê bi zimanekî fermî rewş protestoyan kirin.

Dîsa li Ewrûpayê karistan û nûnêriyên Tirkiyeyê an hatin îşgalkirin an jî hatin rûxandin. Her wiha di serî de li Stenbolê, li gelek metropolên Tirkiyeyê jî bombe hatin teqandin, otobûsên belediyyê û şaxên bankayan hatin şe-


witandin.

Gelek kesên navdar yê dinyayê bi taybetî ji Serkomar Demirel, Serokwezîr Erbakan re protestoyên xwe bi rê kirin. Hin rayedarên hikûmetê diyar kirin ku "mudaxelekirina girtiyên li ber mirinê pêwîst e" lê belê gelek sazî û kesan li dijî vê yekê reaksiyoneke mezin nîşan dan, gotin ku ev tiştêkî pir bi talûke ye û divê rayedar dev ji vê ramanê berdin. Ji van kesan Serokê İHD'ya Stenbolê Ercan Kanar, daxuyand ku wezîr Kazan heyfa xwe distîne. Serokê Giştî yê Baroyan Turgut Kazan diyar kir ku tu kes nikare bêyî destûra girtiyan mudaxele yê wan bike. Ji ber ku belavoka Roma û ya Tokyoyê van tiştan qedexa dike.

Nivîskarên navdar Yaşar Kemal, Orhan Pamuk û Zülfü Livaneli li ser rewşa girtiyan civîneke çapemeniyê li dar xistin. Yaşar Kemal di vê civînê de axaftinê kir û got: "Wezîr Kazan li girtîgehan dest bi cihada xwe kiriye. Emê bersiva vê bidin."

Hejmara girtiyên ku dimirin her roj zêde dibe, roja pêncşemê ku ev nûçe dihat amadekirin, sê girtiyên din can dan; li Girtîgeha Aydınê Müjdat Yanat ji doza DHKP-C'ê, li Girtîgeha Enqereyê Hüseyin Demircioğlu ji doza MLKP'ê û li Girtîgeha Bursayê Ali Ayata ji doza TKP-ML'ê. Bi van kesan hejmara şehîdan gihîşt 6'an, lê heke ev rewş wiha dom bike, wê ev hejmar zêdetir bibe.

DÜZGÜN DENİZ



Şevket Kazan

# Ew li dadgehê ne

## bersûc lê dozdar bû



Na doktor, vê şîretê li min neke, ez nikarim bi ya te bikim. Her ku ez diçime dadgehê mala xwe gişt bi xwe re dibim. Ma ku vê danişînê ez tewqîf kirim û şandim girtîgehê, wê çaxê ezê xwe li serê kê bikim bela, cihê kîjan xortî jê bistînim? Ku tim alavên min bi min re bin, ji efendîtiyê çêtir e. Bila alav li serê min bela bin, lê ez li serê kesî nebim bela.

**D**i sala 1972'an de, li Agiriyê di artêşa tirk de ez serbazekî berwext (yedek subay) bûm. Bi destûr ji bo (iznâ) 15 rojan ez hatibûm welêt. Bi gumana min, meha berfanbarê bû; Apê Mûsa jî li welat, li gundê Stilîlê bû. Bi endamên rêxistina DDKO'yê re li Amedê dihate darizandin. Di her danişînê de diçû Amedê, dadgehê.

Min bihîst ku li gund e, min zehf bêriya wî jî kiribû. Ez rabûm çûm dîtina wî. Wê şevê rêdan neda min ku vegerrim Nisêbînê. Êvarê civata Stilîliyan geriya. Zehfên wan henekvan bûn. Di gotin:

– Heyran kar û barê me heye, em nikarin li teniştê we rûnin, bi rêdana we be, dorê bidîne me, da em henek û pêkenokên xwe ji we re bibêjin.

### Gundiyan li hemberî ava germ serî hilda

Henekvanan rê nedidan hev û din. Şev û roja me bi ken û kêf û henekan derbas bû. Êvarê piştî şivê, Apo çay amade kir. Me giştan vexwar. Derengî şevê dîsa çay anî, berî ku em vexwin, gundiyan “Ma ne heyf û xebînetê wî şekirê xweş û şîrîn e ku hûn dixin nav ava germ? Em çayê venaxwin, ka para şekirê me bi xavî bidin me, wê ava

germ hûn vexwin”, gotin û li hemberî ava germ (çay) serî hildan. Dîsa em bi wan henekên wan kenyan.

Piştî vexwarina çay û xwarina şeker, gundî belav bûn, çûn mala xwe. Apê Mûsa jî nû ve rabû, ji bermalê valizê mezînxê Almanyayê anî, li navenda odeyê danî. Kincên xwe dan serhev, xistin valiz. Dûv re betanî û şimika xwe anî, ew jî xistin valiz. Hey çavên xwe digerrandin, ka dê çi têxe valizê. Dawiyê çû ji kulmê zemberîşeke (berzîneke) biçûk anî, ew jî danî hundirê valizê û hey li nava malê diqepiçe, tiştan tîne bira xwe. “Min fûtîka (çarşeva) ser doşekê ji bir kiriye”, got û ew jî anî.

Min jê pirsî: – Ev çi ye? Te mala xwe gişt xist hundirê vî valizê. Sibehê tu dê biçî dadgehê û vegeerî, hey tu di vê danişînê (celsê) de nayê girtin; eger tu bêyî girtin jî emê pêdiviyên te bi pey te de bihinêrin (bişînin). Ji bo çi egerî, tu dê wî valizê hanê li serê xwe bikî bela?

Min dît gorbihuşt hat li ba min rûnişt û dest bi axaftinê kir:

– Na doktor, vê şîretê li min neke, ez nikarim bi ya te bikim. Her ku ez diçime dadgehê mala xwe gişt bi xwe re dibim. Ma ku vê danişînê ez tewqîf kirim û şandim girtîgehê, wê çaxê ezê xwe li serê kê bikim bela, cihê kîjan xortî jê bistînim? Ku tim alavên min bi min re bin, ji efendîtiyê çêtir e. Bila alav li serê min bela bin, lê ez li serê kesî nebim bela.

**Xiniziya herî mezin casûsî ye; heke li hemû girtîgehên yekî kurd bi wî tawanî hebe tu çi bixwazî bila wekî te be, eger gişt tirk derkevin, ka tu dê bibêjî çi? Ka yê bi wî welatî re xiniz û noker tirk in an kurd in?**

**Hûn devê wî vekin, hûnê poşman bibin**

Min lê vegeerand:

– Apo tu bi Xwedê bikî ka hinekî qala darizîna xwe ji min re bike. Tu û heyeta dadgehê ji hev re çi dibêjin?

Bersiva min wiha da:

– Na lawo, em tu tiştî ji hev re nabêjin. Bi serê te ew jî bi ser palê min vebûne; min nadin axaftinê. Serokê heyetê “Hûn devê wî vekin, hûnê poşman bibin” dibêje, ji endamên din re. Lê di danişîna borî de dadgerekî ji endamê dadgehê, ji serok rêdan xwest “Ma ez dikarim pîrsekê ji Musa Anter bikin. Tu tîkiliyê pîrsa min bi babeta

darizînê re nîn e”, got. Serok rê da û dadger jî min pîrsî. Got:

– Ji bona çi hûn kurd bi wî welatî re xiniz (xayîn) in?

**Ka tirk an kurd zêdetir xiniz in?**

Ez xalê te me. Ma ez di bin vê peyva wî de dimînim. Min lê vegeerand û got:

– Ger tu xwediyê peyva xwe bî, we-re ez û tu emê ji Culemêrgê ta Edirneyê li temamî girtîgehên bigerin, ka ewên di girtîgehên de tawanê wan çi ne, em giştan qeyd bikin. Tu jî dizanî ku xiniziya herî mezin sîxurî (casûsiya) ya bi dîgelên (dewletên) biyan re ye; eger yekî kurd bi wî tawanî hebe tu çi bixwazî bila wekî te be, eger gişt tirk derkevin, ka tu dê bibêjî çi? Ka yê bi wî welatî re xiniz û noker tirk in an kurd in?

Serok li wî debengî vegeerî û got:

– Min ji we re gotibû wî nepeyivînin xwe paqij derxist û em tawanbar kirin. Dev jê berdî, di danişîna dawî de emê para wî ceza lê bibirin.

Ji ber vê yekê ez dizanim ku ji ceza ne bêpar im. Her ku biçim dadgehê divê ez mala xwe, bi xwe re bibim.

# Dahûrîna peyvvan (1)

**Her kes peyva "çepik" bi kar tîne. Ez bawer dikim ku kêma kes dizane ku ew peyveke hevedudanî ye û ji hêla şeweyê ve gelek guherîn tê de çêbûne. Peyv ji "çepil" û ji parkîta "k"yê pêk hatiye. "Çepil" mil e, lê ew bi qonaxa demê re li peyva "çepik" dageriyaye. Mirov di nav gel de di şûna "mil" de bi hêsanî li peyva "çepil" jî rast tê. Nimûne: Çepildirêj, bi çepilên wî/wê girt,**

**W**ekî her kesî me jî berê peyv ji aliyê teşe û awayan ve nas nedikirin. Peyvên hevedudanî ji me re mîna peyveke sade û bi serê xwe xuya dibûn. Piştî ku em bi ziman re bilî bûn, em bi ser wan ve bûn.

Êdî ew hem ji aliyê wateyê (maneyê) ve û hem jî, ji aliyê teşe û şeweyê ve wekî peyveke xwerû û sade ji me re dihatin. Jixwe ziman mîna organîzmeke candar e. Gelek peyvên me hene ku ji aliyê wateya xwe ya hîmî ve guherîna û cihê xwe dane wateyên mecazî.

Ji bo nimûne; her kes peyva "çepik" bi kar tîne. Ez bawer dikim ku kêma kes dizane ku ew peyveke hevedudanî ye û ji hêla şeweyê ve gelek guherîn tê de çêbûne. Bêyî ku em zêde xwe berdîn kûraniya mijarê, em dê bi mînakên lê bixebitin ku peyvvan dahûrînin (yanê kelîmeyan tehlîl bikin) û mijarê ronî bikin.

Di vê nivîsa pêşîn de em dê çend peyvvan hildine destê xwe û li dahûrîna wan bixebitin. Hin ji wan çendî basît bin jî, bi mebesta ku pir nayên zanîn, em dê li ser wan jî bisekinin.

**Çepik:** Peyv ji "çepil" û ji parkîta "k"yê pêk hatiye. "Çepil" mil e, lê ew bi qonaxa demê re li peyva "çepik" dageriyaye. Mirov di nav gel de di şûna "mil" de bi hêsanî li peyva "çepil" jî rast tê. Nimûne: Çepildirêj, bi çepilên wî/wê girt.

**Kergoşk:** Ev peyv ji sê hêmanan (unsûran) hatiye pê. Peyva pêşîn "ker" a duyemîn "goş" û ya sêyemîn jî parkîta "k"yê ye. Em wan bi hev ve deynin; *ker+goş+k*.

Li virê dibe ku "goş" bê pirsîn. Em li ser wê jî rawestin. Goş, di kurmançiya îro de wekî "guh" û "go" tê bikaranîn.

Em wê jî bi nimûneyan rave (îzeh) bikin, lê bi peyveke hevedudanî. Bergoşk, ku jê re "pelegoşk" û "belegoşk" jî tê gotin. Bergoşk jî navê beşeke serê mirov e û ew beş ji aliyê paş ve, di navbera guh û patika serî de ye. Ji vir jî xuya dibe ku berê me ji guh re, "goş" gotiye.

Em peyva "bergoşk" jî dahûrînin. *Ber+goş+k*. "Ber" pêrkît, "goş" nav û "k" jî parkît e.

Me divê em daxuyînin ku di zaravayê kirdkî (dimilî/ kurmanckî/ zazakî) de navê guh "goş" an jî "gos" e.

Îcar di nav kurmançixêvan de ji yekî zêdetir (ji aliyê şeweyê ve) navê kevroşkê tê bilêvkirin. Nimûne:

Kîroş, kîvroşk, keroşk, kêvroşk, kêrguh, kergo û hwd. Bi taybetî di "kergo"yê de her tişt êskere ye. Heye ku gelê me ji ber guhên kevroşkê dişibe guhên kerê, loma ev nav lê kiribin.

**Çarlepik:** Ev peyv jî dîsa ji sê hêmanan hatiye ba hev; *çar+lep+k*.

Em dê bi tenê li ser "lep" bisekinin ku ew di wateya dest de ye; ku lepik jî bi saya parkîta "ik"ê ji "lep" hatiye çêkirin. Her wiha kesên ku dibêjin "çarepk", "çalemp" û "çalep" jî hene. Ev peyv jî, gava ku zarok (pitik) hinek firoke û givrikî dibin, li ser her du dest û piyên xwe bi rê ve diçin, ji bo wê rewşê tê bikaranîn.

**Amojîn û xalojîn:** Her çendî ev her du peyv basît bin jî, ji aliyê şeweyê ve; em lê

rast tîne ku dîsa ji pir pê nayê zanîn.

Heta em ji hin nîqaşan re dibine şahid ku peyvên "amojin", "xalojin" û "jinap", "jinaxal" didine ber hev û her kes îdia dike ku ya wan ji ya dinê rastir e.

Ev çar peyvên li jorê, ku lêzimîti û xizimîtiyê diyar dikin, tev rast in. Em wan ji hev bikin: Peyva "amojin" ji "mam" û "jin"ê; her wiha "jinap" jî, ji "jin" û "ap"ê pêk hatine. Em li ser "xalojin" û "jinaxal"ê jî rawestin, lê tenê em wan jî hemanên wan bikin; "xalo+jin" û "jin+xal."

Çar peyv jî hevedudanî ne û li gorî qaydeyên zimanê me rast in. Tenê cudayî ew e ku her herêm wan li gorî xwe bi kar tîne.

**Dotman û pismam:** Ev jî wekî peyvên li jorê, hevedudanî ne bi eynî qaydeyî pêk hatine. "Dot+mam", "dot" keç, qîz e û "mam" jî ap e. "Pis+mam", li vir jî "pis" di wateya kur û law de ye.

"Dotmam" ango keçap, qîza apê. "Pismam" ango kurap, lawê apê.

Em çend peyvên din jî derpêş bikin: "Dotmîr" yanê keça mîr, "pismîr" yanê lawê mîr, "pîsxaltî" yanê lawê xatî (xaltî/xalet) yê; ku hin herêm "pîsxaltî"yê wekî "bîlxaltî" bi lêv dikin.

Li ser vê mijarê em çend gotinên pêşiyar jî pêşkêş bikin û em dawî li vê nivîsa pêşîn binin.

*Dê bibîne dotê bîne,*

*Dê û dotê pev çûn ji kêmaqilan ku ji hev çûn,*

*Neke li kesan ku neyê serê nefsan wê bê serê pisê pisan.*

ZANA FARQÎNÎ

## Cesaret û çareserkirin

ALTAN TAN



**H**emû kes pîrsgirêkên Tirkiyeyê dizanin û li ser tespîtîkirina van probleman hemfikir in:

Pîrsgirêka kurd...

Ahorî...

Problemên siyaseta karê derve...

(dîplomasi)

Pîrsgirêkên bi laîkiyê ve girêdayî...

Ji aliyê sazî û îdareya dewletê ve kevnî û pûçbûnî...

Di tespîtîkirina van pîrsgirêkan de tu îhtîlaf tune ye. îhtîlaf û cudabûn di terzên çareserkirinê de derdikevin.

Ev pîrsgirêk li benda çareserkirinê ne. Refah li îktîdarê ye, gelo wê bikaribe çareser bike? Ji bo ku bikaribe, divê bi mantîk, sebir, aram û biryar gavên bêtirs bi pêş ve biavêje.

Wê bikaribe van gavan biavêje?

Pirsa herî giring îro ev e û ez pê ne

bawer im. Lewre ev hikûmet dema ku hate damezirandin, li pişt deriyên radayî çî bû, çî qewimî, kes pê nizane. Lê gelek îdia hene; wekî ku Erbakan ji bo gelek tiştan û di serî de jî ji bo pîrsgirêka kurd û laîkiyê temînat daye leşkeran. Ev tîne gotin, em nizanin rastiya van gotinan çî ne û em nizanin ku rastiya van temînatan hebin, wê ev rastî heta ku bidome...

Eger Refah bikaribe û biwêrîbe dest biavêje çareserkirina pîrsgirêkan, wê ji Tirkiyeyê re bibe hêviyeke ronahiyê... Lê ez ji vê yekê zêde ne bihêvî me.

Ji bo çareserkirina pîrsgirêka kurd, heta îro pêşniyazeke Refahê nehatiye ziman. Di nav Refahê de parlementerên ku dixwazin li bakurê Iraqê dewletekekurd were avakirin jî hene, lê gelek parlamentên wan ji binî naxwazin ku peyva "kurd" were ziman... Di vî warî de siyaseteke wan a êskere û net tune ye, ji ber vê yekê jî mirov nikare pê ewle bibe, ne diyar e ku wê çî bikin...

Ez naxwazim bêhêvîtiyê belav bikim, lê rastî jî ew e ku ez bi xwe bêhêvî me. Her çiqas realîte bi xwe hemû hêz û

rêxistinan ber bi aşî û çareserkirinê ve bide jî, hinek hêzên bitesîr dibine asteng, her tiştî bi paş ve dikişînin. Reaksiyoneke wiha zid li holê heye.

Çareserkirineke ku Suriye, Iraq û Îran pê qail nebin û bi piştgiyariya derdorên leşkeran tunebe, Refah nikare xwe lê biceribîne. Ne ew hêza Refahê heye, û ne jî ew cesareta wê...

Em nizanibin ku çî temînat dabin leşkeran jî, çawa ku tê xuyan Erbakan jî wê wekî Tansu Çillerê siyaseta xwesipartinê bimeşîne.

Îro statuko ji bo aşî û çareserkirinê ne amade ye û belkî dilê hinekan jî bimîne, lê kurd bixwe jî hêj bi temamî jî bo çareserkirinê ne amade ne. Her yek dibêje ya wê pîrsgirêk bi min re were çareserkirin, yan jî na!.. Rêxistineke kurdan dema gavekê bi pêş ve diavêje, yê din peşle lê dixin, vala derdixin...

Û tiştê ku herî min xemgîn dike jî ev e.

Hêviya min ji Xwedê ew e ku di warê siyasete de, kurd di demeke kurt de xwe bi ser hev ve bidin û millet rojek zûtir ji van derd û kulan xelas bibe...

# Şûrên Mûaviye di destên ên nû de ne

**Xîmê îslama dewletî, Xelîfeyê misilmanan ê 5'an Mûaviye yê kurê Ebûsufyan avêt. Dewletên Emewî, Ebasî, Selçûqî, Osmanî û Îranî jî li ser wê bingehê bilind bûn. Pê re jî gelek qirkirin pêk anîn.**

**Ji 12 îmamên şîiyan Alî û kurê wî Huseyn bi kuştinê, 7'an jî jehrî bi wan dane vexwarin û ji holê rakirin. Ji 12 îmaman 3 heb di nav nivînên xwe de tama mirina asayî wergirtine. Bi vî awayî dijberên xwe ji navê rakirin.**

**W**aliyê Şamê Mûaviye bi alîkariya zalim, xwînrêj û talankeran xîlafet ji Hesenê kurê Alî stand. Ew li pêşiyê, xenîmetxwar li piştê wî bûn, bi leşkerên xwe kolanên bajarê Kûfê xelas kirin û berê hespên xwe zivirandin riya Şamê.

Mêjiyê wî bi xîmê misilmaniya dewletî ya nû mijûl bû. Jixwe ola îslamê ji bo serbirin, malwêrankirin, kambaxkirina gund û bajaran bûbû çekeke hêsan û bêzehmet. Cihgirtina Xwedê ya erd tameke xweş dabû devê wan. Di navbera çend salan de bûbûn xwedanê keriyên mihan, garanên heywanan, reviyên hesp û mehînan, qesran, bi hezaran kole û cariyên. Ji bo wan dewlemendiyên bêîza û berjewendiyên bêtixûb, şerê xîlafetê dijwar û bêmirwet dimeşiya.

## Wan bi hêza şûr îktidar bi dest xistin

Her roj ji bo hin serfirandinên nû şûr dihatin tûjkirin û jehrîkirin. Nalên hespên artêşa wî ya serxweş, ji kêfan, sînga deştê dikelandin. Toza qulozbûyî wekî ewrekî reş û tarî vedizeliya hindava Kûfê û bakurê wê Mezopotamaya kevnar.

Yek ji serleşkerên wî yê qesab Ebdullahê kurê Amir hate rex Mûaviye û jê pirsî:

– Bizivire, bizivire carekê temaşê bike li artêşê, ser û binê wê ne diyar e, ya Xelîfeyê me.

Xelîfeyê nû li ser milê xwe zivirî û got:

– Ka bide min şûrê xwe.

Serbazê wî Ebdullahê kurê Amir şûrê xwe dirêjî xelife kir.

– Yê ku dirêj dibe erdî tuyê lê bixî û bikujî. Mîna durûna çandinan dê xenîmetan kom bikî û belav bikî. Ji sisiyan di du ji bo xwe, yekê jî dê belav bikî da ku şûrê te yê din jî bigihe ezman. Dema ku tu erd û ezmanan negihîni hev tuyê hêza xwe berze bikî. (Bekir Yıldız; *Zalim û bawerker û kербela- Rûpel:38*)

Ez bawer im ku di dîrokê de pênasiya olê îslamê zilamekî tenê rast û durist kiriye, ew jî xelîfeyê îslamê Mûaviye yê kurê Ebûsufyan e. Ger pênasiya rast

ev nebûya, dê ji ber çî her sê neteweyên îslamê yê ku hezar û pênc sed sal ol û xîlafet di kîler û kadinkên xwe de veşartî; faris, ereb û tirkên birayên xwe yê olî kurd, çawan bêhejmar di tevku-

jiya re derbas bikirana? Di bin tev biryarên qirkirin, koçberkirin û wêrankirina kurd û Kurdistanê de mora Xelîfeyên îslamê heye. Ma qey di 15 qirnan de, li dora 40 serhildanan, her dem ew

kedxwarên dagirker heq, kurd neheq bûn? Ma Xwedê ji wan hersêyan re dewletçêkirin helal, ji kurdan re heram kiriye?

Belê, li jorê di nav peyvên Mûaviye de tiştên pir girîng hene. Lê mixabin kes dîrokê naxwîne û kesek jî naxwaze bixwîne.

Ji Hegel pirsîne:

– Wan ên (dersên) ku ji dîrokê bêne wergirtin çî ne?

Bersiva zanayê mezin ev e:

– Ne dewletan, ne jî gelan tu tişt ji dîrokê negirtine.

Xîmê îslama dewletî, Xelîfeyê misilmanan ê 5'an Mûaviye yê kurê Ebûsufyan bi vî awayî û bi van gotinan avêt. Dewletên Emewî, Ebasî, Selçûqî, Osmanî û Îranî jî li ser wê bingehê bilind bûn.


## Navê jinavêhildana dijberan: Kuştin û jehrandin

Bihêlin tevkujiyên li ser gelê kurd domandî, ji 12 îmamên şîiyan Alî û kurê wî Huseyn bi kuştinê, 7'an jî jehrî bi wan dane vexwarin û ji holê rakirine. Ji 12 îmaman 3 heb di nav nivînên xwe de tama mirina asayî wergirtine.

Îro jî gelek, guherînên girîng çêbûne. Dîsa destê mêtîngêhen Kurdistanê her wekî Mûaviye anî ziman du şûr hene. Yek li erdê, serê kurdên bindest dibire, yê din berê xwe hilkişandiyê ezman, bi navê olî berevanî û parastinê li hevalên xwe dike. Li cihê Mûaviye qatîl Tikrîtî Seddam Huseyin; li cihê Yavuz Selîm Alparslan Tırkeş û li cihê Şah Ebas jî Haşimî Rafsancanî rûniştîye. Kar her ew kar, stran jî dîsa ew stran e.

Dema Amerîkayê li ser hin welatên Asya, Afrîka û Amerîkaya Latîni yê bindest, kedxwarî dikir, di dest de şûrê erdê tûj, lê yê ezmanî ko bû. Ji ber ku ola serdest û bindestan cuda bû. Bes di destê xwînmij û xwînrîjên Kurdistanê de her du şûr jî tûj in. Heta şûrê ber bi ezman di mêjûya kedxwariya kurdan de bûye makîneya serbirîne, yanê giyofîn.





● 29.7.1992: Nûçevanê Kovara Özgür Halk'ê Çetin Abayay li Batmanê ji aliyê kontr-gerîla ve hate qetilkirin. Hêzên tarî yê dêwletê ji ber ku kirinên wê yê li herê mêmê, ji aliyê raya giştî ve neyên zanîn dest bi kuştina nûçevan û nûnerên rojname û kovarên kurdan kirin. Qatilên Çetin hê jî nehata girtin.

● 31.7.1992: Nûçevanê Rojnameya Özgür Gündemê Yahya Orhan li Kercewsa Batmanê ji aliyê hêzên kontrayî ve hate kuştin. Yahya Orhan jî wekî her rojnamevanî mafên xwe yê nûçevaniyê bi kar dianî, lê ji ber ku nûçeyên bi rojane zêdetir gel agahdar dikir û li Kurdistanê çî diqewimî digihande xwendevanan; vê jî astengî derdixist pêş politikayê

dewletê, ew jî bi destê dewletê hate kuştin. Qatilên wî jî nehate girtin.

● 1.8.1914: Destpêka Şerê Cihanê yê Yekemîn

Piştî Şoreşa Fransîz ya bûrjûwa li Ewropayê pêlên neteweperweriyê dest pê kirin. Gelên ewrûpî yê bindest ji bo azadiyê û serxwebûnê dest bi şoreşên girseyî kirin. Navenda Ewropayê ji wî alf ve pir germ bûbû. Di 1.8.1914'yan de li Saraybosnayê, bi kuştina qralê sîrpan şer dest pê kir.

Wekî tê zanîn dewleta Osmanîyan li çar parzemîni belav bûbû. Piştî şer, navê dewleta Osmanî guherî, bû Tirkiye û bi tenê li ser axa Anadolê û bakurê Kurdistanê ma.

AWIR

# Der heqê dengbêjî û helbestên Homeros de

Hîmê çand û wêjeya me wêjeya devkî ye. Ta wêjeya devkî baş neyê naskirin û pelîşandin (tehlîlkirin) di warê çandî de hilperîneke baş nayê pê. Îro hêdî hêdî li ser dengbêjiyê gengêşî tene lidarxistin, baş e. Divê mirov vî rengê neteweyî bi pîralî binirxîne.

Dîroka wêjeya me, şewaz, teşe û şemala toreyaya me, şaxên jîyan û civaka me hinek jî di wan hilperînan de veşariye. Mirov bi yekcarî nikare bibêje felan tişt baş e, an jî xerab e. Nivîskarî bijartî bin jî, peywira wan a mezin ev e ku wêje û toreyê bidin ber bayê, zelal bikin, encama keda xwe bajon ser şaxeke civakî.

Di dawîya biharê de dema mirov diçe çiyayê Kurdistanê li nik belekiyên berfê, tebaqên cemedê yê zirav û firê dibîne; ku mirov wan tebeqeyan hildide berfinên stûxwar tîn dîtî. Ku mirov cemedê bide ber lîngan, berfin jî dihejîqe.

Hinek nivîskar berhemên Homeros (nivîskarê yewnana kevnare) hem şîr, hem çîrok, hem serpehatî, hem destan û hem jî roman dihesibînin û dipejirînin. Ev tespişteke rast e.

Esas mebesta min ne nirxandina berhemên Homeros e. Di hêla teşe û şewazê de kilamên dengbêjan û helbestên Homeros pir nêzikî hevûdu ne, heta em dikarin bibêjin wekhev in. Di herduyan de jî şayes (taswîr) şaxeke girîng e û gotin û bêje li dûv şayesê tê. Taybetiyên berhemên Homeros taybetiyên kilamên dengbêjan in jî ango kilamên dengbêjan jî hem helbest in, hem çîrok û hem jî roman.

Hesta dengbêjan hesteke neteweyî ye. Belê

naveroka kilamên wan bi piranî kuştin bû kuştin e. Gelo ev heya çend salan wisa bû? Lewre temenê dengbêjiyê ne kin e. Ev nexweşiya bi dengbêjan tenê re tune ye. Îro jî ji bo pereyan (diravan) piraniya hunermendan ji toreyê û civaka xwe direvin û pal werdigerînin. Jixwe kilamên dengbêjan bi tenê ne kilamên kuştinê ne.

Hem ji bo girîngiya berhemên Homeros hem jî ji bo nêzikbûna kilamên dengbêjan û helbestên Homeros ez li vir jî pirtûka Homeros Odysseus (weşanên Can, beşa 14'an, rûpel: 250-251, bi tirkî: Rira Erhat-A. Kadir) beşekê pêşkêşî we bikim.

"Du hev xinzîr girtin û anî, herdu jî kirin qurban,

Piştî ku giş qijiland, anî û li ber Odysseus danî,

Lî hemberî Odysseus rûnişt û ew keremî ser xwarinê kir:

"De bixwe mêvano, ê ku li para me xulaman ketiye, hûrîkan em dixwin; xinzîrên bi rûn begên me dixwin,

ew ne ji çavên yezdan ditirsin, ne ji dilê wan ji bo kesî diêşe.

Dema dijmînen xerab niyet derdikevin ser axa biyanan,

Zeus hêza talankirinê didê wan, bi hêsanî dadiqurtînin malên me û talan dikin.

eman eman tu hêviya merhemetê ji wan meke.


Çiqas roj û şev ji Zeus ve bêne, ew qas qurbanan dixwazin, yek du ne bes in ji wan re."

Belê rihê bêjeya di helbestên Homeros û kilamên dengbêjan de rihê qehremaniyê ye.

**Di hêla teşe û şewazê de kilamên dengbêjan û helbestên Homeros pir nêzikî hev in. Di herduyan de jî şayes şaxeke girîng e û gotin û bêje li dûv şayesê tê. Taybetiyên berhemên Homeros taybetiyên kilamên dengbêjan in.**

## ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



### Bavê Kemalîstan osmanî ne

Lî Tirkiyeyê her ku diçe kemalîzm pûç dibe û dirize û ji binî ve hildiweşe. Vê carê ji bo rizgarkirina kemalîzmê dixwazin careke din sistema Osmanî vejînin û bi paş ve bînin. Wekî ku tê zanîn kemalîzm bi serê xwe ne tu tişt e. Ew li ser bîngeha aborî, civakî û siyasî ya osmanî hatiye damezirandin. Osmanîyan bi tenê kirasê xwe guhartine. Wekî marê ku kirasê xwe biguhêre. Lê, mar dîsa mar e. Dewleta Tirkiyeyê niha dixwaze bi îdeolojiya tirk û îslamî piçek be jî temenê kemalîzmê dirêj bikin. Ji ber vê riya rizgariyê di N. Erbakan û partiya wî Refahê de dibînin. Erbakan kirin serokwezîr. Erbakan û partiya wî Refah dixwazin careke din fatîhe li rûyê ecdadê xwe Osmanîyan bixwînin û wan ji nû ve ji goristanê rakin.

Di şûna hesp û şûr de vê carê bi tank û balafirên şerê taybetî, Rohhilata Navîn û Balkanan dagir bikin. Erbakan di axaftineke xwe de wiha digot: "Çima em di dema Osmanî de mezinê Rohhilata Navîn û Balkanan bûn û niha jî ketine vê rewşa xerab? Belê manewiyet kême, ji ber wê! Heger em wekî partiya Refahê desthilatdariyê bigirin destê xwe, em dê dîsa wekî berê bibin mezin û pêşengê Rohhilata Navîn û Balkanan."

Belê Erbakan û partiya wî ne xwediyê îdeolojiyê politikayê nû ne. Ew bavê kemalîstan in. Politikaya Erbakan û Refahê ne nû ye, ew 600 salî li ser gelên Rohhilata Navîn û Balkanan bi darê zorê hatiye meşandin. Mîras û berhemên Osmanîyan 600 salan îşxal, talan û wêrankirin e. Erbakan neviyê kalê xwe yê Osmanî ye. Ji 600 salî ve xwîni ye û mêrkuj e. Ji Osmanîyan misilman dernakevin. Ji Osmanîyan demokrat dernakevin. Yek tiştêk jê derketiye ew jî kemalîzm e. Yavuz Sultan Selîm, bi darê zorê xelîfeti jî ereban girt û got: "Ez xelîfe me."

Ecdadê Erbakan ew in û îro Erbakan di riya Yavuz de dimeşe. Yavuz çawa li ser navê misilmantiyê bi milyonan kes di devê şûr de derbas kir. Erbakan jî niha bi sed hezaran bombeyan di ser serê kurd û li Kurdistanê dibarîne. Wî heft pêhn li gora Şefê Polîsan û Wezîrê Edaletê yê berê Mehmet Ağar xistiye. Ji girtiyên ku li zîndanên di greva birçîbûn de ne heta niha sê kes şehîd ketine û çend kes jî li ber mirinê ne. Kazan ji kemalîstan hezar car kemalîstir e û dixwaze hemû girtiyên bikuje. Polîs û eskerên Kazan û Erbakan, dayikên windayî û girtiyên didin ber dar û jopan. Wehşeta hikûmeta Erbakan di navbera çend hefteyan de, tu nav û deng ji ya Çiller û Mesut re nehişt. Wiha xuya ye ku di navbera çend mehan de dê Erbakan bibe Fîrewn.

### Tu bi xêr hatî Kamber Ronî

Te roja 5'ê tîrmehê gava xwe avêt vê cîhana tijî xweşî û reşî. Me divê tu di nava xweşî û geşiyê de mezin bibî û her tim doza wekhevî û azadiyê bikî.

Çavên hevala Sultan û hevalê Zana wekî navê te ronî bin.


**Xebatkarên Rojnameya Azadiya Welat**

# Bersiva baştirîn ji bo nîjadperastan têkoşîna şoreşgerane ye

**W**ekî ku em dizanin 30 sal zêdetir e ku hûn bi şîrê re mijûl in, gelo hûn dikarin ji me re hinekî qala wê ezmûnê bikin?

■ Zarokî çavkaniya hemû xewn û hêviyan e. Heke şair an nivîskar ji wê çavkaniyê qut bibe, ziwa dibe. Pêwîst e ku çavên zarok û dilê zarok tim bi me re be, ji ber ku her tim bi şeweyê nû cihanê bibinin. Ji lew re jî tim û tim ji paqijiyê wê berfê em li pêşerojê binêrin. Zaroktiya me rih e ji bo niha û heya mirinê, bi her cureyî; tarî an ronî, bandora xwe li ser jiyana me, didomîne.

Min zaroktiyêke pir bi hêstir û îşkence dîtiye, dişibiyam kevrosêke bê-hêlîn. Bavê min zû mir, piştî mirina wî em li hev belav bûn, êdî diya me bû bavê me jî, lê ew jî çend salek dewam kir û êdî diya min ji nû ve zewicî û ket pey bextê xwe yê nû.



## E

**z hê zarok bûm ku cara yekemîn min wêneyê Qazî Mihemed bi şeweya daleqandî dît, ew wêneyê wekî bombeyekê di canê min de teqiya û ez hejandim.**

dibûn.

Ji zû ve li nik min Kurdistan yek Kurdistan bûye. Her wiha yek azar û yek hêvî jî bûye. Cara yekemîn bi rêka kitêba "Meseley kurd - Bileç Şerko", min his kir ku tirkên dagirker çi zilm û zorek li gelê me kirine.

*Her çi qas jî, ez naxwazim pirsên laseyî (teqlîdî) bikim, lê pêwîst dibînim ku bibêjim, piştî ew çend ezmûn, Şerko niha çawa li şîr dinêre?*

■ Şîr li cem min eşq e. Bêşq şîr ji dayik nabe. Garantiya pêşmergeyêkî çek û sengerê wî ye, ya şair jî şîr, peyv û nivîsên wî ne. Ez berdewam dibêjim; bejna trajedî û qurbanîyên me, ji bejna edebiyatê me pir bilintir e. Hejmara wan şîr û nivîsînan pir hindik e ku. Bi qasî xwîna şehîdekî germ bin. Bi qasî qurbanîyên me û karesatên me dagirtî bin.

Bi qasî qîrîna zarokêkî dê û bav kuş-tî xwediyê bandorekê bin.


Bi qasî evîna pêşmergeyêkî ku aza-

kê di canê min de teqiya û ez hejandim. Pirsên mezintir li cem min çêkirin. Wî wêneyî rîya kurdîyê bi min da naskirin, min his kir ku ez ji neteweyêke binlingkirî me û welatê min jî li sêdarê ye. Ji wê pencereyê şîrên ax û evîna dar û berê welat hatin nav peyv û canê min. Bi piranî şîrên dîwana min a yekemîn "Tirî fey Helbest, 1968" (Tavehîva Helbestan); hawara azadî, xwîna şehîd û wan qehremanên ku di nav şoreşên Kurdistanê de bûn qurbana serfiraziyê. Temenê min 20 sal bû ku di helbestekê de, navên wekî Dêrsim, Diyarbekir, Berdeqareman, Çiyayê Agirî, Dr. Fuad û Çiwarçira (Çar Çira) derbas

diyê hembêz dike û canê xwe jê re pêşkêş dike, mezin bin.

Kêm gel hene ku bi qasî gelê me jiyana wan pir bi birîn û zam e, pir bi bêbeşî be, pir bi merg be. Her rojêke me romanek e û her saetek qesîdeyêke dirêj e.

Li Başûrê Kurdistanê dema ku nîfşê me çavên xwe vekirin, guhertineke mezin çêbû, em ketin newaleke pir bi bahoz. Dijmin dest bi kurdqiranê kir. Min hemû rojan ew çiya û gelî didîtin ku agir ji wan bilind dibe û wan dişewitînin, min his kir ku ew dûman û agir, ji min şîrên nû yên zindîtir dixwazin, ji wê jî zêdetir ji min gavanin dixwazin.



## B

*Rewşa edebiyata kurdî li başûrê welêt niha çawa derbas dibe?*

■ Niha, li başûrê Kurdistanê bizaveke edebî ya mezin heye, bi taybetî jî di warê helbestê de. Şairên bi tiwana (îmkan) û behredar hene. Hin caran qesîdeyên ew qas xweşik dibînin, ku ji qesîdeyên herî bedew ên cihanê ne kêmtir in. Ev nîfşê ku niha dinivîse, piraniya kesên ji wî nîfşî çavên xwe vekirine li nav zilm û zorê. Nivê wan ji nav kuştin, birîn, dûman, Enfal û Helebçeyê ne û her wiha nivê wan ji nav rapêrînan in. Helbet şîr jî hene ku di bin bandora berhemên rojava de mane. Ev şîr dişibin zarokêkî ku dê û bavê wî ne eşkere be û xwediyê tu nasnameyêkê jî nebin. Bêbêhn û çêj (tahm) in.

Şîrên resen û rasteqîn ew in ku wekî rihê dar û berûyên Kurdistanê ne, wekî çavên keçên kurd in, dişibin kanî û çiyayan, ev şîr dê her bijîn.

*Baş e ew berhemên ku bi kurmanciya jorîn tî nivîsandin?*

■ Nav bi nav hin helbestên kurdî ku bi şeweya kurmanciya jorîn tî nivîsandin dibînim, piraniya wan helbestan ji aliyê hunerî ve jar in.

Dişibin mirovên kêmxwîn. Vekirî û pir rasterast (dîrekt) in û bi gotinên asayî (normal) dagirtî. Zêdetir mîna nezm in, yanê qiseyên rût in û hatine rêxistin. Şîr hunereke giran e, dagirtîtirin şeweya derbirîne ye. Wêneyê ye, xuxuşa çem e û dengê baranê ye, manşeta roj-nameyêkê nîn e.

Ne şert e ku şîr her bi dengê bilind biaxive. Hin car hene pisteya şîreke bedew ji qîrîneke mezin karîgertir e. Şîr dişibe birûskê, birîweya (deng) çivîkan û hilqulîna kaniyê. Şîr, zimanê wê ye nerasterast heye, ne gotardan û tiştên din e. Li nik piraniya şairên Bakur şîr bûye cureyek ji qiseyên protestoyê, mirov pir caran wisa his dike ku di nav meşekê de ye, ne karekî hunerî dike. Şîr divê şîr be, êdî mijara wê çî dibe bila bibe. Heke nebe şîr, hingê ni-

**ejna trajedî û qurbanîyên me, ji bejna edebiyatê me pir bilintir e. Hejmara wan şîr û nivîsînan pir hindik e ku bi qasî xwîna şehîdekî germ bin.**

yazê paqij jî, wê nake şîr.

*Em hinekî ber bi siyaseta û têkoşîna ve jî biçin. Wekî hûn jî dizanin zêdeyî 11 salan e ku li bakurê welêt têkoşîneke çekdarî li dijî zilm û zordestiyê tê meşandin, gelo hûn wê tevgerê çawa dinirxînin?*

■ Ez tenê ew qas dibêjim; bizava rizgarîxwaz a Bakur, bizava berxwedanê ya hemû neteweya kurd e. Vê bizavê jî nû ve kurd bi jiyana kir, dîsan can da dîroka me ya tevîzî, ji dayikbûyîneke nû bû, wê mij li pêş çavên kurdan rakir ku wisa dihat zanîn tu car naçe.

Çendîn milyon kurd bîranîna dîrokî ya xwe wînda kiribin jî, lê wê tevgerê bîranîna û hişyarbûna ji wan re çêkir û di tarîtiya şevê de rê ji wan re vekir. Ev jî nû çêbûnek bû wekî destanê. Wekî ku tu, du çavên sax dîsa bidî yekî kor û guhên ker vekî û ji nû ve yekî lal bi ziman bikî.

Binêrin; wan mirovan çawa Tirkiyeya gur tirsandine. Tirkiyeya gur aştîyê naxwaze û mirinê dixwaze. Bi ya min



Di sala 1940'î de li bajarê Silêmanî ji dayik bûye. Kurê şairê bi nav û deng û nîştimanperwer Faîq Bêkes e. Yekemîn helbesta xwe di sala 1957'an de di rojnameya Jin de li Silêmanî weşandiye. Dîwana xwe ya yekemîn jî,



di sala 1968'an de bi navê "Tirîfey helbest" yanê Tavehîva helbestê weşandiye. Di nîveka salên şêstan de heya şikestina 1975'an wî sirgûnî Erebestanê dikan. Di 1984'an de careke din tevî şoreşa Kurdistanê dibe. Di sala 1987'an de derdikeve Ewrûpayê û li Swêdê bi cih dibe. Di heman salî de xelata Toxolîkî bi dest dixe. Sala 1992'yan di yekemîn hikûmeta Federal a Başûr de dibe Wezîrê Çandê û di 1994'an de ji ber sedemên nedemokratîk dev jê berdide.

Niha li Swêdê dijî. Wî heya niha zêdeyî 15 pirtûkên helbestê weşandine, ku di nav wan de helbestên asayî, çîrok, destan, qesîde û helbestên romanî hene.

Helbestên wî li gelek zimanan mîna Îngilîzî, frensîzî, almanî, swêdî, îtalî, erebî û tirkî hatine wergerandin.

baştirîn bersiv ji bo van rejîmên nîjadperest têkoşîna şoreşgerane ye. Va ye serê te jê dikan û tevî kenîne serê te yê jêkirî nîşanî dinyayê didin. Çi dikî!? Heke gerilayên te nebin, divê tu li benda mirinê bî? Ew tu yasayeke jiyane jî napejirîne. Tirkiyeya îro dişibe gayekî dîn. Doza kurd li Bakur bûye Ararat, êdî çawa tê weşartin!? Bikujên kurdan, ewên ku mafên mirovan, demokrasî û azadiyê dikujin, êdî nikarin rehet bijîn, heya êrîşê diwartir bikin, jiyana xwe tehtir dikan. Heya derî li ser aşiyê bigirin, henaseya xwe tengtir dikan. Tu zorê bidî kevokê jî, dê bi nikulan te kor bike.

encamdana karên tekûz.

*Nêzikî salekê heye ku xebatên germ ji bo sazkirina Kongreya Neteweyî hene. Wekî rewşenbîrêkê gelê kurd, derbarê wê mijarê de hûn çi dibêjin?*

■ Dagirkerên Kurdistanê berdewam dixebitin ji bo gor çêkirinê ji bo kurd û dixwazin bi hev re pêşî li serhildana me ya mezîna bigirin û her wiha rê li pêşerojê me jî bigirin û nehêlin ku em henase bidin. Ku wisa be, di vê berdana jixebata gelê kurd. Ez li vir vê jî bibêjim; bi tenê ew hêz, alî û kesan dikarin bê-tirs tevî kongreyê bibin ku ne tenê bi dev, belkî bi kirinê (pratîk) jî hevbeş dibin di serxistina vê projeya mezîna neteweyî de. Her wiha ewên ku beşdar dibin divê girêdayî tu dagirkerî nebin, xwediyê biryara siyasî ya xwe bin, kontrola wan di destê dijmin de nîn be, belkî wekî çiyayên Kurdistanê serbilind bin û nikare bi wan were lîstin. Mezintirîn karesata hin hêzên siyasî jî

şîrî ye. Filmek e ku ji çavkanî û ji dayikbûnê ve tê, heya digihêje roja me ya îroyîn. Ez û dîrok bi dirêjîya 56 salî. Ez û xem û azarên jiyana min bi xwe ne. Bûyer, trajedî, şoreş, şikestin, mîna ku çavê kamerayê ew kişandibin û gav bi gav bi wan re hatibe; min xwestiye di vê hewldana nû de careke din bi temaşekirineke nû helbestê bixînim nava destan, ku ew bi xwe jî di hembêza şano û destanê de ji dayik bûye. Ev berhem dirêjtirîn berhema şîrî ye di edebiyata kurdî de.

Ji 5360 dêrî zêdetir e. Melodiya wê bi xwe heye, zimanê şîrî û çîrokê tevî hev û din dibin, neynikeke bejnîzîrav e. Bi ronî û tarîtiya xwe çemek e.

Siruştî Kurdistanê ye bi pestî (acizî) û geşbûna xwe. Canê diya min e bi lorîn û helbestê, bavê min e jî bi hemû germî û hawara xwe. Hevalên min ên şehîd in. Nexşeyek e ku birîna Dêrsimê, hawara Kerkûkê, evîna Mehabadê û xoşewîstiya Qamişloka bi hev re dikeşîne. Ez nêzikî 9 mehî mijûlî nivîsandina wê bûm.

Hêviya min ew e ku, di sala pêşiya me de ezê wê biweşînim, lê bîyî ku ez biweşînim, xwezî min ew e ku, heke derfet hebe, ez îsal vegerim Kurdistanê û li bajarê min î xoşewîst, li Silêmanî, di du rojan de rû bi rû li pêşiya rewşenbîran û dostê şîrî wê berhemê bixwînim, ji bo ku careke din jî, ji nû ve ji dayik bibim..

*Hûn MED TV'yê çawa dinixînin?*

■ MED TV ew deng û reng e ku hemû sînoren Kurdistanê xerab kiriye, Silêmanî, Diyarbekir, Mehabad û Qamişlo di çavê xwe de kom kiriye. Di jiyana gelê me de ev bûyereke şaristanî ya mezîna e. Pêwîst e em wê bi pêş bixin û biparêzin. Dilxweşî ew e ku di demeke ku gerilayek di sengeran de li ber xwe didin û şerê azadî dimeşînin, hevkat gerilayeke din jî di qada rewşenbîrî û medyayê de di şer de ye. Ev wekî wê ye ku di destekî de gul hebe ji bo aşî û xoşewîstiyê û di destê te yê din de jî çek ji bo xwe parastinê.

Berxwedan di hemî asta jiyane de, xebat li berfirehtirîn meydanê, çek peyv, deng û reng tevî hev dibin ji bo

**Ewê ku dibe qurbanî jî dîsa kurd e, hêzên Kurdistanî û gerilayên me ne, çima ew jî hev negirin? Mafekî me ya siruştî nîn e ku kongreya me ya neteweyî jî hebe? Mafekî me yî asayî nîn e ku em jî bi hev re bipeyivin, da ku xwe biparêzin û me nexin wê gorê bi komel? Bi ya min heya rojek zûtir Kongreya Neteweyî çêbe baştir e, heya dereng jî çêbe ziyana me ye. Kongreya Neteweyî dibe hêzeke mezîna ji bo jiyana kurdan.**

yan û mirinê de, ewê ku dibe qurbanî jî dîsa kurd e, hêzên Kurdistanî û gerilayên me ne, çima ew jî hev negirin!? Mafekî me ya siruştî nîn e ku kongreya me ya neteweyî jî hebe?

Mafekî me yî asayî nîn e ku em jî bi hev re bipeyivin, da ku xwe biparêzin û me nexin wê gorê bi komel!? Bi ya min heya rojek zûtir Kongreya Neteweyî çêbibe baştir e, heya dereng jî çêbibe ziyana me ye. Kongreya Neteweyî dibe hêzeke mezîna ji bo jiyana kurdan û

ew e ku gotin û kirina wan ji hev dûr in, pir caran jî tenê ji bo propagandeya siyasî bi Kongreya Neteweyî re ne, lê di qada kar de xwediyê gawekê jî nîn in.

*Hûn niha li ser kîjan berhemê dixibetin?*

■ Berhema min a dawî ku hê jî destnivîs e, di meha çaran a îsal de qediya. Helbestê romanê ye, navê wê "Xaç û Mar û Rojîmêrî Şair" e. Panorameyeke dîr û dirêj e. Yadaştnameya (bîranîn)

# Heval Zîlan

Kî dikare fêm bike  
heval Zîlan  
Kîjan psikolog  
Kîjan humanîst  
Kîjan "Demokrat"  
Kîjan dîn?!  
Kesê ku çîroka  
Geliyê Zîlan  
Qoçgirê, Pîranê  
Amedê, çiyayê Agirî  
Dêrsimê, Mehabadê  
Helebçe  
Nizanibe  
Nikare fêm bike  
Heval Zîlan.  
Kesê ku  
Çîroka şerê qirêj  
Qirkirina gelê kurd  
Qirêjkirina namûsa  
Qîz û jinên ciwan  
Mezinahiya şehîdan  
Windabûna li serê kuçan  
Temartina hêviyê  
Qîz û xortên ciwan  
Hêstirên çavên jinebiyan  
Hêstirê çavê jinebiyan  
Hêstirên çavên sêwiyan  
Hesreta xerîbiyê, hesreta evîniyê  
Hesreta welat



Zîlan (Zeynep Kınacı)

Derdê bêwariyê  
Hesreta jiyaneke birûmet  
Nizanibe!  
Nikare fêm bike  
Heval Zîlan.  
Kîjan psikolog  
Kîjan humanîst  
Kîjan "Demokrat"  
Kîjan dîn  
Dikare fem bike  
Heval Zîlan?!

ZEKÎ SEYDA

# Kurd kî ne?

Yekî pirs kir û gote min,  
"Kurd kî ne?"  
Min bersivand, "çavan veke bibîne!"  
Hinek ji wan pir xizan in, hejar in  
Bêbindar û bêxwarin in birçî ne  
Nahizirin bê ji bo çi wiha ne  
Xemsar in ji rewşa xwe bêgîlî ne  
Hinek ji wan li ber Dicle û Ferad in  
Dîsa qirka wan ziwa ye her ti ne  
Hinek ji wan li ser lingan digerin  
Lê nizanin ku ji mêj de mirî ne  
Hinek ji wan koçber û penaber in  
Li welatên biyaniyan xwînî ne  
Hinek ji wan nizanin bê ken çi ye  
Tim bi ax û bi nalîn û girî ne  
Hinek ji wan ji dijmin re kûçik in  
Para wan gezkên nan û hestî ne  
Derdê wan ku zikê xwe biçêrinin  
Haya wan, qet ji gelê kurd nîn e  
Hinek noker û xiniz û xayîn in  
Bêesl in û bêaqil bêmeji ne  
Hinek li dû terş û talan û mal in  
Malê dinê gelek bi wan şîrîn e  
Hinek ji wan bi dijmin re hevpar in  
Axa û beg in li koşkan rûniştî ne  
Hezar sal in mîna xilt û gornebaş  
Sererd û bînerdê kurdan dizîne  
Hinek ji wan dilê xof û tirsê ne  
Xwe li piya nagirin tim ketî ne

Hinek cerdevan in qaşo ew mêr in  
Cihê tije ku kerê bi terî ne  
Hinek ji wan dibêjin "ya min çi ye?"  
Xwe ker dikin li piştê razahî ne  
Hinek ji wan pîrbêj in lê nalivin  
Seboker in, bi fitne û hesûdî ne  
Hinek ji wan bi peyva xwe wek şêr in  
Roja qewamê torîk û rovî ne  
Ji vê yekê kurd hêsîr û bindest in  
Axa kurdan çar parçe û kerî ne  
Lê hinek kurdan serî hildan û rabûn!  
Bi xwîna xwe dîrok nû nivîsîne  
Ew neviyên Şêx Seîd û Elîşêr in  
Ji Seyid Rizo û Îhsan ne bêrî ne  
Ew dozdarê Qoçgirê û Amed in  
Li dû tola Dêrsim û Agirî ne  
Eşîrtî û bend ji holê rakirin  
Netewa kurd bi bîra gel anîne  
Mîna baz û piling û şêrên har in  
Çiya bo wan koç û mal û hêlîn e  
Wek Xabûrê xwînê diherikînin  
Lew Kurdistan ji bo wana evîn e  
Piştî hezar salan bi saya wana  
Êdî îro kurd tev li riwê spî ne  
Gelê kurd li ser wana dilerize  
Lew ew hêviya kurdan a dawîn e.

JÎR DOLOVAN

# Mezheba şeşan



Mehmet Erbakan

Îro rewşa me bûye nexweş  
Lewre rabûn hinek rûreş  
Şertên îslamê kirin şeş  
Me rojî û nimêj, zekat anîn cih  
Me kir em biçin Hecê  
da em bibin laci  
Gotin: Ka şertê altincî  
Gerek e tu bibî kemalîst û turancî  
An jî bikî mubayad ji bo Xumeynî  
Ev ola li nav tirkên  
Çêkirin da pê bixapînin me kurdan  
Ev ola bêdad nehatiye ji ba Yezdan  
Belkî amade bûye ji nik şeytan  
Kiriye weswesa li bal hinek murîdan  
Wekî Yılmaz, Fethullah û Serokê  
Refahê Erbakan.  
Binêre li koma rûreşan  
çawa damezirandin  
Mezheba şeşan.  
MAMOSTE CÛDÎ

Ji Muhemed Emîn Pêncwênî helbestek

# Dijistan!

Derya katê tûre ebe  
Areq eka û xwê erêjê..!  
Ême xwêkey ekeyine tam..!  
Yan ke egrî, be şeste baran..!  
Zewî be bergî qewzeyî daepoşê..  
Ay ke bexşinde ye derya û  
Mîlnebane....!  
Minîş ke bade noş ekem  
Xefet exom!  
Firmêskî wekû belalûk,  
Ebarênim bo zemanê!  
Eger mey pirjêni bikem!?  
Bo xefey gul!  
Towî şîrê eweşênim,  
ke şax enerênê wek dêw..!  
Ewe qînî bêzarî ye le postalê,  
Le pîk û nwêl!?!  
Şewgar ebête maman î  
Wekû Miryem jan eygirê  
Ca be qûdretî azar..!  
Yaxûd be pêçî janewe,  
Taşe berdê Îsay ebê...!  
Bende be dûrbînî nizîk,  
Em talan bire ebînim  
Lem çaxî kompîter e, nîtrone..!  
Lem geştî estêre û  
Naw mang çûne..!  
Dîwanê le dayik ebê.  
Ke zayeley tûna û tûn bir,  
Nirkey em kûre daxane,  
Ekete kolî bay şemal...!  
Seretay werzî fer û hat  
Le rehmî derya û çiya da




M. Emîn Pêncwênî

Eçerxênê û şêf ebirê  
Mîn û derya û kêw û şemal...!!  
Ekeyine bûn,  
Yek saniyek..!  
Her ewe ye ke em kewne,  
Tifro eka û rayşî egrê..!  
Minîş giyanî xom xoş ewê,  
Leşîş im le la be be nîrx e..  
Roh im handerme bo lûtke !  
Belam leş im le dûy nayet !  
Le zoranzî da qal im  
Namewê giyan im kirnoş ba..!!  
Naşim ewê leş im bîrê û ba bîba..!  
Dû dije yek  
Min xom exom...!!

## FERHENGOK

Dij: Hember  
Sitan: Paşgir, ji bo cih  
Dijistan: Cihê dij  
Tûre ebê: Hêrs dibe  
Areq: Xwedan  
Şestebaran: Baraneke pir û bi lez  
Qewze: Kevze  
Xefet exom: Diqehirim  
Firmêsk: Rondik, hêstir  
Belalûk: Cûreyek ji mewe  
Tow: Tov  
Şax: Çiya  
Enerênê: Diqîre  
Qîn: Rik  
Weriz: Werz  
Lûtke: Bandev, zirve  
Dêw: Hov.



Li Navenda Çanda Mezopotamyaya Stenbolê Şaxê Beyoğuyê vê heftiyê ev çalakiyên çand û hunerî hene.

● **28.7.1996 Yekşem:** Ji bo bîranîna hozanê nemir Şakiro programeke taybet tê li darxisin. Hin hozanên navdar bi stran û axaftinên xwe ve li ser aliyên Şakiro yê ku nayêne zanîn û hunera wî ya taybet disekinin. Saet: 15.00,

Konserek ji Koma Yenigün Müzik Topluluğu ji BEKSAV'ê, saet: 18.00

● **31.7.1996 Çarşem:** Semînera Ebûqat Suat Parlar li ser Nefta Rojhilata Navîn. Wekî tê zanîn pirsgerêka gelên Rojhilata Navîn a herî mezin ew e ku dewletên mêtînger rê li ber aşî û biratiya gelan digirin.

Ji bo Neftê çî ji destên wan tê dikin. Ji bo berjewendiyên xwe dewletên ku xwe wekî parêzvanên mafên mirovan didine nîşan, ji bo berjewendiyên xwe bi awayekî beşdarî qetlîfaman jî dibin. saet: 18.00

Li NÇM'ya İzmirê jî ev çalakiyên hene:

● **28.7.1996 Yekşem:** Îmze û sohbeta Dr. Cemşid Bender, saet: 15.00 Konsera Hozan Delîl, saet: 19.00

● **29.7.1996 Dûşem:** Şanoya Hêvî, saet: 15.00,

Ji bo zarokan pêşandana Palyaçoyan (Qeşmer û Pêşmer)

● **30.7.1996 Sêşem:** Konsera Hozan Delîl, saet: 19.00

## RÛDAN

# Yekîtiya Nivîskarên Kurd tê avakirin



**Li Ewrûpayê xebatên avakirina Yekîtiya Nivîskarên Kurd tê kirin. Ji bo vê yekê Komîteya Amadekar hatiye saz kirin. Di nav komîteyê de Yaşar Kaya jî heye.**

**G**elê kurd di gihînekên girîng de derbas dibe, pê re jî xwe bi rêxistinî dibe. Ev rewşa hanê di her warî de didome; ji yekîtiya ciwanan heta bi ya xwendevanan, ji rêxistinên pîşeyî heta bi ya hunerî.

Îcar jî lê tê xebitîn ku Yekîtiya Nivîskarên Kurd bê avakirin. Tê daxuyandî ku, xwestek ew e ku sînor û çeperê yekîtiyê berfirehtir be û deng li hemû nivîskarên parçeyên welêt bibe.


Ji bo ku yekîtiyê di demeke herî nêzîk de bê îlankirin, xebat û amadehî ten kirin. Ji bo vê yekê jî Komîteya Amadekar hatiye saz kirin. Di Komîteyê de ev nav hene:

Yaşar Kaya, Dilbixwîn Dara, M. Emîn Pêncwênî, Amed Tîgrîs, M. Sıraç Bilgin, Medenî Ferho, Kemal Mîrevdelî, Selim Ferat û Haydar Işık.

Hate ragihandî ku, di rojên pêş de dê dem û cihê ku Yekîtiya Nivîskarên Kurd lê were îlankirin bê eşkere kirin.

## TÎŞK

LÊRZAN JANDÎL



# Zarava kîrmanckî ser ro tenê pirtûkî

**N**ê nivîsî de ma, karo ke Dr. Friedrich Müller zarava kîrmanckî ser ro kerdo, vîndenîme. Dr. Friedrich Müller verde zarava kirdaskî/kurmancî ser ro, bado jî zarava kîrmanckî ser ro xebetîyo. Sebeta ke na derheq de karo verên o, bêguman no kar bi xo teyna, xo ser, karê de bi qedr o. Dr. Friedrich Müller sera 1864 karê xo yê 21 rûpele kovara Akademîya Zanayene de çap kerdene. Zamano ke F. Müller nê karî ser ro xebetîyo, materyalê Peter. J. A. Lerchî ra îstîfade kerdo.

F. Müller zafêrî vengî kinitê we. Müllerî 14 herfên bi vengî û 3 diftongî ebi herfanên vengênan û 23 herfên bêvengî doz kerdê. Bi kilmîye gor Müllerî zarava ma de 40 herfê esta.

Xêca naye ra Müller derheqanên cêrênan ser ro jî vindeto.

1- Nermbiyena herfanên bêvengan 2- Ere jûbînî şiyene 3- Waroginayena herfanên pênyîye 4- Xo ontene/antene û hîrabiye herfan 5- Nameyî 6- Zafmariye 7- Ezafe 8- Halo rayşt û halo onte/ante 9- Rengdarî 10- Vernameyî 11- Qesedem /barker/lêker 12- Demî; demê nikay; demo hîra; demê verî; demê veriyo rew derbaz bî; emir; demo ke ên...

Bêguman nê karî de gumra şaşîtiyî û sebebê nînan jî estê. Ê jûyîne: Şaşnivîsnayena qesan a. Şaşîtiyên ke Lerchî de estê, Müllerî nê henî guretê û ê bi xo jî kerdê. Ê didîne:

Sebata ke Müllerî zarava kîrmanckî Îraniyo newe û kirdaskî de şanîta têver, gor zon û zarava bîne, herfê newî vetê.

Naca ma di zekokan/nimûnan bidîme. Müller qesa waye (wake/ wa) ze "wai" nivîsneno û gor nayê jî diftongê "ai" doz keno! Nê diftonî ra jî vano: "No verê "a" ya kane (â ya îraniya kanî) cêno." Ya jî qesa kêna/çêna (çêneke/kêneke) ze "keina" nivîsneno û diftongê "ei" doz keno! dê ra jî vano: "No verê "e" ya kane (ê ya îraniya kanî) cêno."

Sebata ke nê nivîsî de ma şaşîtiyan F. Müllerî ser ro nêvîndenîme, naca teyatenê bîr û bawariyanên F. Müllerî û xo ser ro vîndenîme.

Dawîya ke F. Müller resto ci, na wa: Vano ke: "Gor nê halî zaza zaravêde gelê derheqan de kurmanckî ra cûda wa. Ontena qesedeman xerepiya û niya jî halê ontene rêza xo de nêmend. ..."

Hemverê naye, gor kurmanckî/kirdaskî herfa "V" ye verveng de avê ra. (formo kan vîndî nêkerdo)...

Gor F. Müllerî zarava kîrmanckî "o jî zaza vano" zaravêde zonê kurdan/kurmancan a. Bawariya dê û tayê kesanê ke nika vanê; "Zazakî zaravêde zonê kurdan/kurmancan niya" jû niya.

Her çîqa ke karê F. Müllerî zaf kilm o, şaşîtiyê xo gumra yê jî, karêde bingeyî o. Dest eştî her heftî. Analîzê xo gor metodanê îlmî virayştî. Ganî mordem nayê bivîno. Eke mordem biwazo, na zarave bikino we, ganî nê karê F. Müllerî bizano.

Naca çiyêde bîn balê modemî onceno. O jî no wo, ke F. Müllerî verê ma, verê kîrmanckan dest eştî zarava kîrmanckan. Naye rê jî qedrê nê karî tayîna beno zêde.

## Radyoya Mizgîniyê

Li Ewrûpayê:

Her roja şemiyê (sept) êvarê di navbera saet 20.45 û 21.00'ê de li ser pêla navîn (MW), 1395 kHz.

Li Tirkiyeyê:

Her roja yekşemê (lehdê) êvarê di navbera saet 21.00 û 21.30'ê de li ser pêla kin (SW), 31 Metre, 9430 kHz.

Mizgînî, P.K. 1125,  
335441 Biebertal, Almanya

# Çîrokeke beriya 84'an

**R**adyoya wî li ber serê wî bû. Qocixê ku dewletê dabûyê li xwe pêçabû, serê xwe danîbû ser kevirekî, çiftiya xwe danîbû ser sînga xwe, şewqeya xwe xistibû nava çavê xwe û her du destên xwe li çiftiya xwe şidandibûn. Li paş Girê Têznê, ew û hevaleyê wî nobedarê kana madenê bûn.

Ketibû xewneke ku bi hezar salan bifikire jî ew tişt nediketî destê wî, lê li pêş çavên wî bûn. Li qesrekê, qesreke li ser Girê Têznê, aveke spî boz di bin re derbas dibû, çar aliyê wê; darên hewran, gwîjan û kizwanan bûn. Hewşa wê tijî gulên nêrgiz, binewş û sosin bûn. Rengê gulên, evîna dilê wî nexş dikir, kesk, sor û zer. Bayekî xweş î hênik li pelê daran û gulên dixist. Katê daran hêdî hêdî kil dibûn. Xişexîşa pelên daran û dengê avê tevî hev dibûn.

Ew jî li bin holika xwe rûniştibû û cigareya xwe bi kêfeke werê vedixwar (dikişand) ku dilê mirov dibijiyayê. Çayek ku pîreka wî jê re çêkiribû, li ser maseya wî bû. Li dengê çivîk, elok û xişexîşa avê guhdarî dikir. Pîreka wî pir jê hez dikir. Xizmeta wî jî jê re bêkêmanî bû. Çar lawên wî û du qîzên wî her yek bi awayekî, xweşik bûn li ber dilê wî... Te digot qey tiştê di dilê wî de bûn, natibûn xewna wî.

Bi dengêkî, çavên xwe vekir

– Nobedar, nobedaar!

Evdal çengî bû. Çiftiya wî ji ser pekiya û li bin guhê hevalê wî ket. Li radyoya xwe pêledar bû. Lê dengê radyoya wî nedihat. Çavên xwe vir de wê de gerandin, lê tune bû.

Bangî hevalê xwe kir.

– Meheme, Meheme!

Hevalê wî jî çengî bû, got:

– Çi ye kuro?

– Hela rabe! Hela rabe diz hatine me.

Hevalê wî çav li xew, got:

– Dizê çi kuro, qey te xewn dîtîye, qey tu raketiya!

Hevalê wî got:

– Ê ma çima tu nabêjî amirê me hatine.

Zingîni ji serê wî hat, got:

– Bi Xwedê ew in û radyoya min jî birine. Axx, de îcar emê çawa bikin? De wê me ji kar derxin.

Zû rabû ser piyan, bi lezgîni ber bi xwaringeha karkeran çû, li dora xwe nihêrî, kes tune ye, tiştê nehatiye dizîn. Got:

– Bi Xwedê ew in loo.. Ew in û hatine kontrola me û em di xew de dîtin. Ezê îcar çawa bikim, ezê îcar çi xweliyê li serê ariyê bikim. Axx ezê îcar... Axx ezê çi bikim?

Ev cara duduyan bû ku di nobetê de, di xew de zêft dikirin, amirên wî. Lê belê di nava hevalên wî de jî, yê ku pir



**Lê nobedariya malê dewletê..? Hetanî ku dewletê qurîşek didayê, xwîn di dev û pozê wî re dianî. Quran jî xwendibû û li ber pez hîni nivîsandina latîni jî bûbû. Lê ew jî pere nedikir li ba dewletê. Wê şevê hetanî sibehê raneza. Li dora madenê û xwarinxaneyê diçûn dihatin. Hetanî şevqê lê xist, ji wî re ezabekî mezin xelan bûbû.**

hişyar dima ew bû. Hevalê wî, ji ber wê yekê pir pê bawer bûn. Digotin:

– Evdal dikare hetanî sibehê ranezê.

Lê belê mixabin îcar jî şeytan bendî wî ketibû û gotibû:

– Ma tu li ku, Şemrex li ku, amirê wê vê şevê di ku re bêne vê derê?

Ew barê giran ku li ser milê wî, ew westandibû. Ji çar lawên wî du heb diçûn dibistanê, yê din jî mezin ên xwarinê bûn. Qîza wî yek li ber zewacê bû. Navbera wî û pîreka wî ne xweş bû. Nû jî gund koç kiribûn. Li ber deriyê dewletê bûbû karker. Lê belê karkerî û şivanî nedibûn yek. Dema li gund bûn çî demê biçûna cot, çî dema bêhnvedanê,

çifte di destê wî de bû. Li ber pez, çî demê raza û çî demê rabû di destê wî de bû.

Lê nobedariya malê dewletê..? Hetanî ku dewletê qurîşek didayê, xwîn di dev û pozê wî re dianî. Quran jî xwendibû û li ber pez hîni nivîsandina latîni jî bûbû. Lê ew jî pere nedikir li ba dewletê.

Wê şevê hetanî sibehê raneza. Li dora madenê û xwarinxaneyê diçûn dihatin. Hetanî şevqê lê xist, ji wî re ezabekî mezin xelan bûbû. Dema hatina karkeran bû. Bêhnêkê ma, nihêrî ku erebeya karkeran hat, li ber wê sekinî û karker jê daketin. Yê yekemîn daket

daneket, ji Evdal re got:

– Kuro amir got bila nobedarê îşev were ba min, ma we çî kiriye?

Evdal got:

– Em raketibûn bavê min, em raketibûn.

Erebeya karkeran vegeriya Şemrexê. Ew jî pê re çûn. Hevalê wî da dî wî û ber bi qonaxa amir ve çûn.

Dem a çûne ber deriyê amir; şewqeya xwe di destê xwe de pêça, qumçikên çakêtê xwe girtin û li ber derî bi teperepa dilê xwe, li benda bangkirina amir sekinîn.

Êdî li ber derxistina kar nediket, digot:

– Demekê beriya demekê bangî me bikira û em jî, ji vî ezabî xelas bûbûna.

Bêhnêk derbas bû, berdestkê amir derket derve û got:

– Nobedarê madenê îşev hûn bûn?

– Erê

– Werin, amir bangî we dike.

Evdal keserek kişand ji kûr de. Her ku kêferatek dîtibû û tehde dîtibû, keserek kişandibû, her ku keserek kişandibû jî ew keser bûbû qermeçokek û li eniya wî çêbûbû. Ew qermeçokên li rûyê wî dîsa xwe dane ber hev û din û pêkûtiya di jiyana xwe de derman kiribû, hemû wekî xêzên li ser nexşeyê xuya dibûn.

Hêdî hêdî ber bi derî ve çû, li derî xist û ketin hundir. Amir li ser qoltixê, cigareya wî di dest de û bi vî alî û wî alî de xwe dihejand, berê xwe da wan û got.

– Ev cara çendan e ku hûn radizên di nobetê de?

Evdal û hevalê wî dengê xwe nekirin. Li hemberî wî, xwe tawanbar didîtin. Peyva amir a duduyan li pey ya yekemîn hat.

– Herin pereyê xwe yê mayî bistînin ji karmend û herin mala xwe.

Derketin der û ber bi malên xwe ve çûn. Rojêke dîr û dirêj li pêşiya Evdal hebû êdî. Hemû xeyalên ji bo pêşerojê kiribû, tevde ser û bin bûn. Ramanên nû di mêjiyê wî de şîn dibûn. Digot:

– Ax! Ezê zarokên xwe bidime hev û din û koçî metropolên tirkan bikim û çîniya pembo (matodê) bikim, an jî ezê erd û rezê xwe yî gund bifiroşim û dikaneke biçûk pê vekim. Heke ev yek jî nebûn, ezê dîsa li ber deriyê dewletê li benda kar bim.

Lê belê, derdê betalbûnê dîsa dest pê kiribû; birçîbûn û tazîbûna zarokan...


Heta 1984'an wiha hêviya xwe bi Xwedê û şêxê xwe dianî. Hêzeke ku wî ji wê koletiyê xelas bike, qet nedihate bîrê. Lê pişt re baweriya hêza neteweyî li cem baweriya Xwedayê xwe û şêxê xwe dianî, hetanî dawî ya temenê wî jî ew bawerî di dil de ma.

# Çîrokên "Bajarê Mirinê"

Ji ber ku kurdên bakurê Kurdistanê perwerdehî bi zimanê tirkî dîtine, bivê nevé wergerên pêşin ji tirkî tene kirin. Heta niha hin nivîskarên kurd rabûn berhemên biyanî ji tirkî wergerandin, bi dîtina min ev ne tiştêkî rast e, berhem ji zimanê orjinal bîn wergerandin çetir e. Divê pêşî em berhemên bi tirkî wergerînin.

Li aliyê din jî bi sedan rewşenbîrên ku bi bîr û baweriya xwe kurd in, lê berhemên hêja bi zimanê tirkî didin, hene. Wergerandina berhemên wan mirovan, pêwîstiyek e. Çimkî ew êş û azar, bîr û ramanên kurdan tînin zimên. Ji ber vê yekê jî, wergera ku Songül Keskin kiriye, gaveke baş e. Wê, pirtûka çîrokên a Suzan Samanci (Reçine Kokuyordu Helin), bi navê "Bajarê mirinê" li kurdî wergerandiye. Çîrokên Samanci bi giştî li ser gelê kurd in, mirov kare hemû qat û çînen civaka kurd bi hemû jiyana û derûniya wan di çîrokên de bibîne, ji her kar û pişeyî mirov hene; mamoste, polis, gerîla, gundî, bajarî û hwd.

Niha ez dixwazim li ser wergera pirtûkê çend tiştan bibêjim. Hevala ku werger kiriye, yekemîn car dest diavêje karekî wiha giran, lê dîsa jî mirov kare bibêje bi awayekî giştî serkeftî ye. Bi dîtina min ger pirtûk di redaksiyoneke xurt re derbas bûya, wê baştir bibûya. Ji ber ku kêmasiyên rêzimanî û rastnivîsîna hin caran xwendina pirtûkê dijwar dikin. Li vir ez dê çend mînakên bidim. Min ev mînak ji çîroka bi navê "Veger" derxistine. "Roja danê êvarê çilmisî...", bi dîtina



**Gelek rewşenbîrên ku bi bîr û baweriya xwe kurd in, lê berhemên hêja bi zimanê tirkî didin, hene. Wergerandina berhemên wan, ferz e. Ji ber ku wan êş û azar, bîr û ramanên kurdan tînin zimên. Ji ber vê yekê wergera ku Songül Keskin kiriye, gaveke baş e. Wê çîrokên Suzan Samanci li kurdî wergerandiye.**

na min roj naçilmise. "Tevzînok tene tiliyê min î ligan" rastiya wê "tevzînok tene tiliyên min ên ligan." Mirov "î"yê dikare ji bo navê nêr ên yekhejmar bi kar bîne. Dîsa te gotin ku "bêvila min diherike", lê ev wergereke rasterast a "burnum akıyor" e, bi nêrina min kurdiya wê "av/lik/ çilm ji bêvila min te" ye. "Zembelîkê qeşayê diçirisan din" rastiya wê "zembelîkên qeşayê diçirîsîn" e. "Heke havîn bûna wê çiqas xweşbûna ev rê", li vê derê ne rast e ku mirov havînê bike pirhejmar. Her wiha çend mînakên din ên ji heman çîrokê derxistine jî hene, lê ez naxwazim zêde dirêj bikim.

Bi tenê ez dixwazim balê bikişînim ser xeletiya bikaranîna cînavkan û tewangê, ji ber ku di pirtûkê de gelek çewtîyên bi vî rengî hene. Li ser vê mijarê du mînakên ku min ji çîroka bi navê "Asya" derxistine ev in: "... hatin mal û çayê vexwarin..." li vê derê tewandina çayê ne rast e, ji ber ku vexwarin lêkerê gerguhêz e û di hevokên bi vî rengî de (bi lêkerên gerguhêz û dema borî) bireser natewe, lê kirde ditewe. Dîsa "Mirovê ku li hev kom dibûn polîsa wan belav dikirin" jî ne rast e, awayê rast "...polîsan ew belav dikirin" e.

Ev pirtûk ji 15 çîrokên pêk hatiye, ji van çîrokên a bi navê "Evîndara ji Helebçeyê Hatî" ji aliyê Mehmed Uzun ve hatiye wergerandin. Pirtûk bi giştî 95 rûpel e û ji aliyê Weşanxaneyê Avesta ve hatiye çapkirin.

SAMI TAN

agahdarî

Agahdarî


Agahdarî navê weşana Enstîtu- Aya Kurdî ya li Brukselê ye. Weşan mehê carekê tê weşandin. Hejmara wê ya pêşin di rêşemîya (sibat) 1996'an de derketiye. Heta vê gavê çar hejmarên wê gihane destê me. Hejmara çaremîn di gulana îsal de derçûye.

Agahdarî weşaneke li ser çand û hunerê ye. Di nav rûpelên wê de çavên mirov li nivîskarên wekî Medenî Ferho (ku nivîskarê me ye jî), Wezîrê Eşo, Îzolda Bagîrova, Kerîm Baqustanî, Zozan Ozmaniyan, Mihemed Qawas, Xêro Abbas, Şêrko, Mazhar Günbat û hwd.

Di nasnameya wê de jî ev agahî hene: Berpirsiyar Medenî Ferho, Redaksiyon Kerîm Baqustanî, Wezîrê Eşo û Ejder Mihemed.

## Ji birêz Bavê Nazê re

DILBIXWÎN DARA



Kesên ku romana "Çiyayên bi Xwîne Avdayî" xwendine bêguman Bavê Nazê nas dikin. Ew, yek ji wan nivîskarên e ku serê xwe bi pîrsa nivîsandin û rewşenbîriyê re mijûl kirine. Tevî ku hebûna romana kurdî înkâr dike jî, lê belê wî kedeke mezîna di vî warî de pêşkêş kiriye.

Berî vê bi çend salan, li Moskovayê li ser romana kurdî min hevpeyvînek bi wî re çêkir. Em gelekî li ser pîrsên edebiyat, çand û hunera kurdî mijûl bûn. Heya serê sibehê em di nava pêşîrên roman û helbestê de man. Hinek caran em di tariyê de diman, hinek caran ronahî melûl dibû, hinek caran jî serma û seqema Moskovayê xwe diavêta nava hestiyên me û berê me dida Zagros... Bi şefaqê re me hevpeyvîna xwe qedand. Hevpeyvîna hate weşandin. Bi weşandina wê re êşa serê me jî dest pê kir, sînga birêz Bavê Nazê dane ber tîrên rexneyan. Derî li gelek pîrsan vebûn û gotûbêjê dest pê kir, gotûbêja hebûn û nebûna romana kurdî. Nêrin zêde bûn, axaftin dirêj bûn, dev li birînan vebûn û keserên kûr hatine kişandin. Çima?

Bavê Nazê bersiv wekî her carê tûj didan. Tê bîra min, wê demê min pîrseke wiha ji wî kir: "Çima, ji bo çî tu her tiştî înkâr dikî, ev

înkarkirin çî fêdeyê dide pêxistina edebiyat û kultura kurdî? Ez di bersivên te de tu hêviyan nabînim..." Bersiva wî wiha bû: "Ez rastiya dibêjim. Ma hûn dixwazin ez li ser tiştêkî ku tune ye, bibêjim na heye? Min serê xwe bi vê pîrsê re eşandiye, rastiya dibînim û dibêjim, hûn jî vê dixwazin".

Ez dixwazim çî bibêjim? Bila xwendevan wisa nefikirin ku ez dixwazim wê hevpeyvîne careke din dubare bikim, na tiştêkî wisa nîn e. Tenê dixwazim hinek tiştan bînim bîra xwendevanan, belkî ji bîr kiribin, diyar nabe, bûyerên rojane di van rojan de mirov dîn dikin. Ne tiştêkî ecêb e, mirov ji xwe direve, ji xwe ditirse, ji xwe hez nake û berî bîmire ji xwe re di nava miriyan de gorê hazir dike. Di şev û rojekê de her tiştê tû guhartin, tu dibêjî qey xeyalek e, bi rastî mirov bawer nake... Em vê çîrokê ji rojêke din re bihêlin, roj her ku diçin dirêj dibin, niyeta qiyametê nîn e ku rabe û Bûqa Îsrafil dest pê bikin...

Niha jî em careke din werin ser birêz Bavê Nazê û rexneyên wî. Wekî ku xwendevan dizanin li Moskovayê ev çend meh in rojnameya Axîna Welat her 15 rojan carekê bi zimanê kurdî tê weşandin. Di redaksiyanê de li kêleka çend nivîskarên kurd, birêz Bavê Nazê jî cih digire.

Hejmara 5. gihîştê destên min. Nivîseke birêz Bavê Nazê di bin sernivîsa "Rewşenbîrên kurd û gel" de hatiye weşandin. Di vê nivîsa xwe de wekî her carê dîsa ew bi zimanekî tûj rewşenbîrên kurd rexne dike. Ez bi xwe yek ji wan kesan im ku piştgiriya rexnekirina edebî dikin. Ji bo ku em xebata rewşenbîrî û edebî bi pêş de bidin. Vê carê rexneyeke min li birêz Birêz Bavê Nazê heye. Bi taybetî li ser vê

nivîsa wî ya dawiyê. Di vê nivîsê de pêûsa wî zêde hatiye tûj kirin. Ez wisa texmîn dikim ku, di dema nivîsandinê de wî ji tiştêkî aciz bûye, bêhna wî teng bûye. Lê belê mirov di bêhtengiya xwe de nivîseke wisa nanivîsîne, belkî zerara wê ji feydeya wê zêdetir be. Birêz Bavê Nazê çî dibêje û çî dixwaze?

Di gelek alîyan de ez bi wî re me, bi taybetî di warê berpirsiya rewşenbîr û yekîtiya wan de, rexneya wî li gorî nêrina min di cih de ye. Ez naxwazim wî hînî uslûba rexnekirinê bikim, lê bi rastî uslûb jî bo babetên wisa gelekî girîng e. Di nivîsê de rexne li rewşenbîrên kurd tê girtin ku wan wezîfeya esasî jî bîr kirine û bi pey navên mezîna ketine, ev jî qîmeta wan biçûk dike.

Bavê Nazê, bangeke wiha ji rewşenbîran re dişîne: "Rewşenbîrê kurd, bimeşe... bi ku de diçî biçê. Bi alî çep an rast, lê heqê te tune ye ku tu bi rûmetî li ser axa welat bimeşî..." Rexneyeke dijwar e, rê li pêşiya rewşenbîran digire, wan ditirsîne. Di dawiya nivîsê de jî Bavê Nazê giran diçe û dibêje: "Rewşenbîrê kurd, biqîre. Ya rast bireye (mîrov ji mirovan re nabêje bireye, ne gotineke layîq e), bi xwe cihê te reyandina li ber deriyê xwediyê te ye. De teriya xwe bihejîne, belkî xwedî hin hestîyan biavêjin ber te. De xwe bihejîne..."

Xwezî ev gotin ji devê Bavê Nazê darneketibûna, wê çiqas baş bûya. Min dixwest hinek gotinên din ji Bavê Nazê bibihîsim, ku ji rewşenbîran re bibe perspektîv û ronahiyek. Eger îmkan hebe, Bavê Nazê vê nivîsê bixwîne û bersiva min bide, ezê gelekî kêfxweş bibim, ji ber ku gelek xwendevan li benda bersiva wî ne.

# Trêna Karazê

**M**irovekî ji Karaza Amedê diçe leşkeriya tirk. Dema ji leşkeriya tirkan vedigere tê mala xwe, gundî êvarê tene cem. Gundî jê dipirsin û dibêjin: "Tu bi çi hatî malê?" Ew dibêje: "Ez bi trêne hatim." Gundîyan ji tu caran tren nedîtibûn. Ew mirov jî dike û nake bi wan nikare bide fêmkirin, teşbiya trêne. Dibêje: "Bila bimîne, ezê sibê li dawetê bi zindî trêne çebikim ji gundiyan re."

Dibe sibe, diçe dawetê, gundî lê tèn hev û jê re dibêjin: "Te êvarê got ku tuyê trêne bi zindî çebikî ji me re. De ka were çebike." Ew jî dibêje: "Ka ji min re hespekî, şeritekê û torbeyekî kayê bînin." Gundî wan xwestekên wî tînin cih. Dibêjin: "Bila 8 kes jî bîn." 8 kes jî tèn. Wan her 8 kes bi hev

ve girê dide. Li nav çilo hespê jî vedike, hundirê wî jî tijî ka dike. Wan mirovan jî, bi hespê ve girê dide û agir bi kayê dixê. Dû rîmî ji kayê diçe, pêtiya wî radibe. Wê demê piştê hespê dişewite. Mirov, ji gundiyan re dibêje: "Hesp lokomotif e û ew mirovên hanê jî, vagon in."

Dema piştê hespê dişewite, hesp direve. Şerîd di stûyê wan mirovan de xurt dibe û dişidîne. Mirovên ku bûne vagon, dibêjin: "bisekine, bisekine." Lê hespê ku piştê wî dişewite nasekine. Ew mirov jî dibêje: "Trên heyânî îstasyonê nasekine, nasekine, nasekine."

Dema ku hesp dikeve erdê, gundî diherin, dinêrin ku her 8 kes jî mirine.

HASAN HARAN

# Welî oturde

**X**aleta Asya 60 salê xwe derbas kiribû. Wê jiyana xwe li Qubînê (Beşîrî) derbas dikir. Ji ber ku gelek jîr, zana û çeleng bû, di nav jinên derdorê de serkêşî dikir. Bi vî awayî, ne tenê jinên derdorê, zilamê wê Welî jî, di bin emra wê de bû. Her sal jin û mêrên Qubînê dicivand û ji bona karê pembû û çandiniyê berê xwe didan aliyê Anadolê û Çukurovayê. Îsal xaleta Asya, di sa bi serkêşiya 25 jinan hatibû Edeneyê. Hê ji kamyonê peya bûbûn ku axayê pembo ji wan re wiha got: "Anlatın bakalım nereden geldiniz ve ne iş ya-

pacaksınız? (De ka bibêjin hûn ji ku derê hatine û hûnê çi karî bikin?)"

Wê çaxê çavê her kesî çû ser xaleta Asya ji ber ku di nav wan de ew tenê hinek bi tirkî dizane.

Xaleta Asya çavê xwe girt û devê xwe vekir: -Weleh xwarzê, zarok çoxtir, pere yoxtir, mehelidir, feqîrdir, Welî oturde\* û de ka sen çi îşî bidî me jî, bi Xwedê serê me ji te re încedir.

\* WELÎ OTURDE : Welî; zilamê xaleta Asyayê ye. Yanê dixwaze bibêje, em li mala Welî dimînin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

# Şekirê çay

**R**ojê zey ewroy her roj çina biye vay. Hema hema hema çî kewt bi sîka reş. Bê şekirê çay çina wo, bin wînyayê. Şekirê çay qe nê vînyayê. O waxt jew dukandar durist û binamûs bi bi. No ci desta çîci bibiyayê se rotê û xo dest di teva nê temayê. Zem bêrose jî buhayê verîn ra rotê û vatê: "Ez misilmana, misilmanî di stok heram o." Qandê coya millet waxto wînaynî di hema amyê nê xaloy het. Fina rojê wînaynî di jew mêrdek yeno nê xaloy ra vano: "Xalo mi rê şekirê çay bidî." O jî vano ki şekirê çay qediyawo. Mêrdek vano: "To di şekir esto, la balê to şekir stok kerdo, eybo mi rê şekir bidî." Xalo vano "çinyo", mêrdek vano "esto", xalo jî hirs beno, vano: "Kerem ki, nişro, to rê biyarî." Xalo hema şino zera, şekero surek keno paket, ano û dano mêrdekî. O jî şekirî geno, qe xo pey niyewînenno, şino keye. Uja paket akeno, ewneno ki şekirê çay nê, şekirê surek kerdo ci. Mêrdek hema hirs bîno, yêno xaloyî het, vano:

- Mi to ra şekirê çay wayşt, to mi rê surek da.

Xalo çîreno ci ra:

- Qehpe mar oxlî qehpe mar, gawir oxlî gawir, mi to ra va şekirê çay çinyo, to vat esto.

Mêrdek vano:

- Hirs mebi, tê çi ra hirs bîne?

Xalo cewab da ci:

- Hele finê bewnê, ûwo hewna tiya. Xenzîr oxlî xenzîr titî.

Xalo senî ki destê xo çekeno kardî, ewneno ki mêrdeko vinî remeno ki qurşî bîle ci nêreseno.

MEMED DREWŞ


## XELAT...

X	N	A	S	N	A	M	E	Î	T	A
N	E	R	K	O	Z	E	R	T	Z	
S	E	R	T	Î	Z	O	L	E		
M	T	T	A	Z	A	B	E	M		
B	I	L	Û	B	E	N				
R	A	S	A	D						
H	G	A	K	A	Z					
K	O	M	K	A	R					
Ş	O	P	A	R	A	M				

PEYVA VEŞARÎ → MIZRABOTAN

## Bersiva Xaçepirsê (24)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binîrxînî û bi rîva pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 26'an kitêba Helîm Yûsiv "Mirî Ranazîn" e **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



## XAÇEPIRSA BIXELAT (26)


## XAÇEPIRS

Hozanekî Kurd (wêne)	Hidrojen	Kevirên komkiri	Cih	Hogîri	Esil
Partiyekê tirk	Zenetkar	Piştî		Xeber	
	1	Heval			
		%50			
Vekok			Şirove		
Ewa hiri dirêse		7	Sing	3	
				Dengeki mêran	
				Ava şor	
Di bin poz re			Broşur		
Ax			Şiraniyek		
		Mindal		Naveki keçan	
Jor, bilind					
Bi aqil zîrek				Gale...	
5				Sewalek	
				Xwendina tîpekê	
Gihanekek		Cesaret			
	Afirandîyeke mitolojîk				4



PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7



## Serhildan an berxwedan

**H**eya niha gelek serhildan li Kurdistanê pêk hatine. Ji damezrandina Komara Tirkîyeyê vir de sê heb serhildanên mezin ji aliyê rewşenbîran ve tîn pejirandin. Ev jî: Bizava Şêx Seîd (1925), bizava bi serokatiya Îhsan Nûrî Paşa li çiyayê Agiriyê (1930), bizava serokatiya Seyîd Riza li Dêrsimê di sala 1937-38'an de.

Rewşenbîr û pisporên civakî dema ku behsa serhildanan dibe, hema kurtekurt dibêjin Serhildana Dêrsimê, Serhildana Şêx Seîd û Serhildana Zîlanê!. Li gorî min hin terîm teklihev dibin. Pêwîst e em ferqa di navbera serhildan û berxwedan û tevkujiyan de bizanibin. Û bûyerê, wekî navê wê binav bikin. Bi vî rengî ez dixwazim çend serhildanan ji nîqaşê re vekim.

Berê pêşîn em Bizava Şêx Seîd nîqaş bikin. Derfeta me tune ye ku em di vê kurte nivîsarê de dîroka Bizava Şêx Seîd kûr û dûr nîqaş bikin. Bi kurtasî em dikarin bibêjin rêxistina Azadî bi serokatiya Xalî Begê Cîbrî, bizava amade kir. Nêzîkî destpêkê Xalî Beg hat girtin. Mercên wê demê Şêx Seîd kir serok. Em li ser gengeşiya ku "Bizava olperestî ye ne neteweyî ye" nasekinin. Lewre eşkere ye Şêx Seîdê kal di Dadgeha Ewlekarî de bi avakirina Kurdistanê serbixwe hatiye tawanbarkirin. Xala herî mîhîm ew e ku bizavê zû dest pê kir.

Amadahiyan wê hê temam nebûn; xwe neparast û tîk çû. Em dibînin ev bizava ji serî heya dawiyê bi organîze hatiye lidarxistin. Ji ber vî qasî em rasterast dikarin bibêjin ev bizava serhildanek e.

Bizava Agiriyê: Piştî tîkçûna Şêx Seîd komeleyên kurdan li hev civiyan û Xoybûn ava kirin. Ji bo azadiya welêt di bin serokatiya Îhsan Nûrî Paşa de li çiyayê Agiriyê di sala 1930'an de bizavê dest pê kir. Ev jî ji destpêkê heya tîkçûnê bi organîze bû. Ji vî bizavê re jî rasterast em dikarin bibêjin serhildan.

Em werin ser Dêrsim û Zîlanê: Li Dêrsimê kes nikare komeleyekê nîşan bide ku bizava organîze kiriye. Jixwe li vir serhildan çêbûye. Di sala 1923'yan de li tenîştaya Dêrsim, li Qoçgiriya serhildanek çêbûye. Ev niv-kuştî hatibû hiştin. Piştî tîkçûnê temamî deverên din bi hêzekî herî mezin û temamî derfetên dewletê êrîş çû ser Dêrsimê.

**Di 20'ê pûşpera 1930'î de li devera Geliyê Zîlan jin, keç, law, xort, kal û pîr mirovên 12 gundî bi temamî, piraniya mirovên 40 gundên din, li sê cihî hatin komkirin. Cihê herî mezin Newala Milkê ye, nêzîkî 16 hezar kes hatibûn komkirin û tevkûjî hate kirin**



Şervanên kurd li Çiyayê Agiriyê

Dêrsima ku heya wê çaxê tu carî neketibû, tîk çû. Bi hezarah dêrsimî mirin û yê nîyê hatin koçberkirin. Li vir em dibînin tevkujî çêbûye, ne serhildan. Heke were pîrsîn, "Seyîd Riza kî ye?" Seyîd Riza serokê berxwedanê ye. Dema li Dêrsimê tevkujiyê dest pê kir Seyîd Riza bangî dêrsimîyan kir ku li hemberî tevkujiyê berxwedanê bikin. Merc ev e. Ne tiştêkî din e. Bi kurtasî bizava Dêrsimê serhildan nîn e, berxwedan e.

Li Zîlanê ne serhildan ne jî berxwedan heye. Di sala 1930'yî de Serhildana Agiriyê dest pê kiribû. Nav û dengê Îhsan Nûrî Paşa hingî diçû belav dibû. Hinek kesên ku sûcdar bûn û dewlet li wan digeriyan hebûn, di gelfî de diman. Wekî Edoyê Azîzî, Keremê Qolaxazî û hwd.

Dewletê dît zoşê pîl bi pîl belav dibe, wekî Bizava Şêx Seîd nehatiye beravîti kirin û roj bi roj bi pêş ve diçe, wekî dîtina

dewletê pêwîst e hinek tişt pêk werin ku biqedînin, tîk bibin. Ji ber vî qasî 20'ê pûşpera 1930'î de li devera Geliyê Zîlan jin, keç, law, xort, kal û pîr mirovên 12 gundî bi temamî, piraniya mirovên 40 gundên din, li sê cihî hatin komkirin. Cihê herî mezin Newala Milkê ye, nêzîkî 16 hezar kes hatibûn komkirin û tevkujî hate kirin. Di nava van kesan de ji kesên ku dewletê ew tawanbar dikirin tu kes tune bû.

Di dema tevkujiyê de ne serok, ne komele, ne parêzvanî hebû. Bi tenê di sê newalan de hatibûn civandin li benda êvarê mabûn. Ber bi êvarê tev hatin kuştin. Ka mirov wê çawa ji vî bûyerê re bibêje serhildan. Naxêr Geliyê Zîlan ne serhildan e, ne jî berxwedan e, lê tevkujî ye. Ez bawer im kesên ku li ser bûyerên welêt nîqaşan dikin, piştî vî daxuyaniyê êdî nekevin nav xelatiyan.

RASTO ZÎLANÎ

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMİ TAN  
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13  
ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
Biryay Dağıtım  
(BİRYAY)  
NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimîndeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:  
Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost,  
Helîm Yûsiv  
96-321720568

Berlin:  
Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
Remzi İlhan  
312 06 32 31 28

Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

# Hêza Çakûç Erbakan anî ser riya 'Pergala Nû'

Serokê RP'ê Necmettin Erbakan piştî ku bû serokwezîr, li arîşeyên ku li benda çareseriyê ne, rast hat. Li aliyekî rojiya mirinê, li aliyê din Hêza Çakûç û Rêveberiya Awarte, bêhnê lê diçikînin.

**d**ema Partiya Refahê ne li ser kar bû, her tişt ji bo Erbakan hêsan bû, digot: "Dema em werin ser kar wê Hêza Çakûç bi xwe here, emê di cih de bi olê, kêşeya kurdî çareser bikin û Rêveberiya Awarte ji holê rakin, Peymana bi Îsrailê re jixwe berdeham nake." Gelek kes bi van gotinan xapiyan, bi sedhezaran kurd jî di nav de, bi milyonan kesî dengê xwe danê. Ne tenê gelê tirk û kurd her wiha welatên wekî Îran û Sûriyeyê bi gotinên wî xapiyan, lewre bi serokwezîriya wî kêfxweş bûn.

Lê, li welatekî ku lê şerekî kirêt tê meşandin, karê rêveberiyê bi destê Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK) tê meşandin û heta dawiyê bi împeryalîstan ve girêdayî ye, serokwezîr (heke bixwaze jî) jî nikare tu gavên li nik berjewendiyên gel biavêje, jixwe Erbakan jî her ku nêzîkî desthilatdariyê bû, gotinên xwe yên berê jî bir kirin. Lê ev yek têrê nake, ji ber ku çapemeniya "mehmetçik" û MGK'ê gotinên wî hê jî bir nekirine, jê dixwazin ku bi pratîka xwe wan gotinên xwe bide jibîrkirin. Ji bo vê yekê jî, dosyayên Hêza Çakûç û Rêveberiya Awarte derfetên baş bûn.

Hikûmet di warê Rêveberiya Awarte de zêde zehmetiyê nakişîne, ji ber ku raya şovenîstan li pişt e. Kesekî ku kurdan temsîl bike di meclîsê de nîn e,



HADEP li derveyî meclîsê ye, rayedarên wê di girtîgehê de ne. Jixwe xapandina kurdên ku rayên xwe dane RP'ê jî karekî hêsan e, "Şirika me DYP'ê rê neda."

Lêpîrsîneke Ruşen Çakır, roja 24'ê tîrmehê di rojnameya Milliyetê de derket, wî li ser Rêveberiya Awarte dîtînen endam û rayedarên RP yên li Kurdistanê pîrsîne. Piraniya wan dibêjin, hêzên serdest û DYP nahêle ku Rêveberiya Awarte ji holê rabe. Ew didin zanîn ku li herêmê 'OHAL Holding' heye û peyre yê kirêt kontrol dike, ji ber vê yekê jî rakirina Rêve-

Pisporên tirk didin zanîn Tirkîye bi riya Hêza Çakûç Başûr kontrol dike, der barê PKK'ê de agahiyan berhev dike û ji ber ku wê rê daye Hêza Çakûç li hemberî operasyonên wê yên li ser Başûr kes dengê xwe dernaxe.

beriya Awarte negengaz e. Her wiha tê gotin ku her wê rakin jî, wê hemû waliyan bikin super walî û rev ji berê xerabtir bibe.

## Hêza Çakûç pir giran e, Erbakan nikare rake

Di warê dirêjkirina maweya Hêza Çakûç de ka hikûmetê diwartir e, lewre hêzên şovenîst ne li pîvê hêzê ne. Heta niha piraniya çapemenî û partiyên tirk li dijî Hêza Çakûç propaganda kirin, ne ku ew li dijî hêzeke împeryalîst in, çima ku ew naxwazin kurdên Başûr tu mafî bi dest bixin. Dîsa ew dixwazin gavên ku tevgera azadiyê li Başûr avêtine bi şûn vegefin. Her wiha jî, rayedarên tirk dixwazin Hêza Çakûç wekî navgîna şantajekê bi kar bînin.

Ji bo vê yekê jî, van daxwazan dikin; divê nave da hêzê ji Zaxo were Silopiyê, welatên ku Hêza Çakûç pêk anîne divê bi danezanekê bidin zanîn ku ew li dijî parçebûna Iraqê ne. Pêwîst e çalakiyên rêxistinên ku ji bo alîkariya mirovan kar dikin, di bin çavê dêriya tirkên de be; hewce ye 55 milyon dolar taznînatê bidin Tirkîyeyê; zorê bidin Sûriyeyê da ku alîkariya PKK'ê neke, bazirganiya di navbera Tirkîye Iraqê de serbest be, Kampa Ertûşê an bê girtin ar bikeve bin kontrola Tirkîyeyê (wekî ku pez bispêde) û hwd.

Ji van daxwazan ên wekî ji Zaxoyê rakirina navê da Hêza Çakûç û bazirganiya bi Iraqê re, nayê jîrandin, ji ber ku Amerîka bi vê hêzê Iraqê kontrol dike û çavên Îran û Sûriyeyê jî ditirsîne. Li aliyê din nûnerên Amerîka, Fransa û Îngilîstanê Tirkîyeyê pêleke nû ya penaberan tehdît dikin.

Pisporên tirk didin zanîn Tirkîye bi riya Hêza Çakûç Başûr kontrol dike, der barê PKK'ê de agahiyan berhev dike û ji ber ku wê rê daye Hêza Çakûç li hemberî operasyonên wê yên li ser Başûr kes der xwe dernaxe.

Hin kesên wekî M. Ali Birand jî politikaya dewletê rexne dikin û didin zanîn ku Tirkîye kontrola xwe ya li ser Başûr winda dike û kontrola Îran û Sûriyeyê zêde dibe. Birand di quncikê xwe de rojên 22 û 23'ê tîrmehê diyar dike ku, ew dewlet deriyên sînorên başûriyan re vedikin, ji ber vê yekê jî pêdivîya başûriyan bi Tirkîyeyê kêmtir dibe. Li gorî Nivîskî rojnameya Sabahê M. Ali Birand heta ku li Tirkîyeyê li herêmê pîrsgirêka kurd çareser nebe, Tirkîye nikare tu gavan ber bi pêş biavêje.

Erbakan ji niha dibêje: "Em nikarin li hemî Amerîkayê rabin." Ev diyar dike ku wê maweya Hêza Çakûç dîsa dirêj bibe. Lê hem partiyên kurd, her dewletên împeryalîst jî şantajên Tirkîyeyê zivêr bûn.



Hêzên leşkerî yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li kûçeyê Zaxoyê tene dîtînin.